Nav: Isma’îl Umer

Bîr û boçûnên we

Danhev û amadekirin: Qado Şêrîn

Berge: Şiyar Emo

Çapxane: Han-Berlin

Sal: Çapa yekemîn 2011

Mafê çapê ji " Qado Şêrîn"  re parastiye

# Pêşgotin

Mirin xeyd û cudahiya di navbera giyan û giyan de ye, ne xeyd û cudahiya di navbera laş û laş de ye. Ji ber wê bi gumana me, gelek kesên bi laşên xwe mirine, lê giyanên wan li ser refikên zêrîn ên dilê me bi cih bûne.

Mirin ew a ku mirov ji mirov dûr dixîne, destên xoşewîst û xêrxwazan ji hev vediqetîne, dê û lawan ji hev dûr dixîne, lê qet nikare giyanê miriyan ji zindiyan dûr bixîne, nemaze mirovên navdar û xêrxwaz, aştîxwaz, rêncberên miletan, hezkerên zarokan, mîna Barzanî, Şêx Seîd, Garîbaldî, Servants, Nilson Mandêla, Van Gogh û gelekên din. Ew nemirî ne, belê zindî ne, çimkî giyanên wan hîna jî mîna çûkên azad di asmanê me yê azad e difirin.

Ji bo min Ismaîl Umer mirovekî wisa bû, ku giyanê wî dê mîna çûkekî azad di nav me zindiyan de bifire bi kêmanî ta ku em, em hezkerên wî zindî bin.

Taku mirov zindî be bilind nabe yan jî gerek bilind nebe, lê hin mirov ku dimrin hin bilind û hin jî zindî dibin. Tenê diktator di zindîbûneyê de bilind dibin û ku hema dimrin ketinek pîs dikevin û piştî du rojan tên ji bîr kirin.

Bi gumana min eger Ismaîl Umer ne ji wan kesan baya dê ev pirtûk amade nebûya, dê ewqas nivîs û hezkirin diyarî giyanê wî nebûya. Piştî mirinê zindî û bilind bû.

Piştî min bi dehan gotar û helbest û tiştin din li ser giyanê wî yê paqij hatibûn nivîsandin, xwendin, piştî nirxandina wan gotar û berheman, sûd jê girtina wan berheman, mîna sûd girtina ji dîroka mirovekî ku 47 sal ji temenê xwe diyarî me kir, min wek dost û hezkerekî nemir biryar da ku wan nivîs, berhem, gotar, bîr û boçûnan berhev û kom bikin û li dawiyê bikin pirtûkek ji dîrok û paşerojê re.

Li gor bîr û boçûnên gelek nivîskarên ku dikarîbûn di derbarê nemir de binivîsin û bibin sedema çapkirina vê pirtûkê, belê bibin şahidê dîroka 47salan ji nivîsandina dasîtanên hezkirin û aştiyê. ew mirovekî taybet û qam bilind bû, nerm û ziman xweş bû. Dikarîbû li her kesî guhdarî bike. Hevdu pejirandin, li hevdu guhdarî kirin û ji hevdu hezkirin ji bîr û baweriyên wî bûn, belê ji exlaqê nemir bûn. Ji ber wan sedeman ev pirtûk amade û çap bû.

Min ji bo amadekirina vê pirtûkê nûçeyek bi du zimanan-kurdî û erebî-di medya kurdî ya nivîskî de belav kir û ji her kesê ku du gotin li ser nemir nivîsandibin bila ji me re bişînin, hinan şandin û hinan jî yekser di medya kurdî de weşandin, me rabû ew nivîs ji medya girtin û birin û daxistin pirtûkê. Me hewl da em hemû nivîs û berheman ên ku li ser nemir hatibûn nivîsandin berhev bikin. Dibe ku min nikarîbû hin nivîsan, ew ên ji me re li ser maila taybet a pirtûkê *pirtuk@live.com* nehatibin û me jî di medya de nedîbin, di vê pirtûkê de bi cih nekiribin, îca lêborînê ji wan dixwazim.

Me nivîs û gotar di orjînala wan de, di nav bêhn û pergala wan a xwezayî de hiştin, me destê xwe neda wan, daku hest, bîr û boçûnên nivîskaran bi wan bêhn û kulîlkan re ji dilan biçin ber dilan, bê ku di xaçirêkan re derbas bibin.

Pirtûk erşîvkirina hest, bîr û boçûnên hezker, dost û hevalbendên riya azadiyê ne. Êdî spasiyek germ ji bo hemûyan, ew ên ku giyanê nemir Isma'îl Umer bi tîpên rengînî nivîsandin. Ji hinan re, ji berebabên bên re bû dîrok.

Me soz û biryar daye ku çapa duyemîn di sala duyemîn de çap bibe, û hewl bidin şaşî û kêmaniyên çapa yekemîn rakin û nehêlin, îca lêborînê ji her kesê ku şaşî di derheqa wî de bûbe, dixwazim. Hûn dikarin têbînî û pêşniyarên xwe li ser E-maila pirtûkê: *pirtuk@live.com* bişînin.

Spasî ji bo alîkariya Silêmanê Mecîdo; rûpela yekemîn û sêyemîn ên pirojeya pirtûkê. Spasî ji bo Xorşîd Seydo: te çilo dikarîbû wan astengiyan azad bike. Her wisa spasiyek germ û taybet ji bo her pênc birêzan: Dilawerê Zengî, Cumha Emo, Silêmanê Mecîdo, Şêx Dawidê Xelîl û mamostayê min Salih Umer, her pêncan dikarîbûn jiyana nemir li qelemên zêrîn bidin. Û Meksîmê Îsa dikarîbû ji her pênc gotaran, ji bo kurdî jiyana nemir wergerîne kurdî, gelek spas ji bo keda wî jî.

La dawî, pêşniyar û biryara çapkirina pirtûkê ya min bû, lê dîsa jî bi hin dost û hevalên nêzîk mîna Silêmanê Mecîdo şêwirîm. Min biryara amadekirina pirtûkê da û

da çapê. Min dikarîbû vê yekê ji dostê xwe yê nemir re bikim û giyanê wî di nav rûpelan de biparêzim.

Li dawiya dawî, pirtûkê diyarî giyanê nemir Isma'îl Umer û hezkerên wî dikim. Bila çûkên azadî û hezkirinê li ser kinarê derya gora te çîrok û serpêhatiyên me vebêjin, taku çîroka rêzgarkirinê bi dawî bibe.

Qado Şêrîn
28/03/2011

# Jiyana nemir Ismaîl Umer

Têkoşer Ismaîl Umer di sala 1947-ê de li gundê Qerequyê hatiye dinyayê.

Derbasî dibistana seretayî ya gund bû û ji kesên biserketî di dibistanê de bû. Bi temenê 14 salî tev li xebat û têkoşîna siyasî ya kurdî bû. Xwendina xwe li dibistana El Yermûk li bajarê Dirbêsiyê berdewam kir û poline baş bi dest xistin, ku dikarî bû beşê Erdnîgariyê li zanîngeha Şamê bixwîne. Piştî ku xwendina xwe li zanîngehê kuta kir, tev li artêşa Sûriyê bû û pileya Sitvan (Mulazim) wergirt û di cenga Tişrînê de serkêşiya hengelekê (ketîbe) kir, ku bi zanebûna xwe karî bû hemû hevalên xwe biparêze.

Tevî ku têkoşer Ismaîl Umer li gundê xwe mamosteyek bû, wisa li nav malbat, heval û dostên xwe ji kurd, ereb, ermen, suryan û aşûriyan mamosteyê siyasetê jî bû. Taybetmendiyeke vî mirovê xwendekar û mamoste di civakê de hebû, ku karî bû bi qezenceke mezin derbasî têkoşîna siyasî bibe.

Di salên 70-yî de nemir Ismaîl Umer wek mamosteyekî hezkirî ji hêla şagirt û xwendekarên xwe ve dihate naskirin. Mirovekî hêmin bû û pir ne dipeyivî. Dema ku dipeyivî, mirovên dora xwe bi awayekî nerm ber bi xwe ve dikişandin. Bi van xeysetên xwe nemir Ismaîl dikarî bû hezkirina leşkerên hevalên xwe di artêşa Sûriyê jî de bi dest bixe. Derbarê cenga Tişrînê gotineke wî ya balkêş hebû, ku digot: „ Ku mirov nikaribe welatê ku li ser ji

dayik bûye û di bin ezmanî wî de jiya be, biparêze, ew mirov dê nikaribe Kurdistanê jî biparêze“.

Mamoste di qonaxeke dijwar re ji qonaxên parçebûnên El Partî derbas bû, lê rewişt û têgihiştina wî ne hiştin, ku bikeve nava nakokiyan û digot: „ Verastî ne tenê li rex me ye, aliyê din jî hinek verastî li rex wî heye. Ev nelihevkirina di çarçeweya tevgera kurdî de tevî tehliya wê tiştekî asayî ye, ku divê em jê sûd û havilê wergirin, da ku em li ser tiştên hevbeş di nav xwe de kar bikin. Bi vê yekê emê karibin derfeteke firehtir ji tevgerê re bi dest bixin û ji van çarçeweyên partîtiyê yên teng rizgar bibin. Ew çarçewe tenê giyanê parçebûnên bêsedem di nav me de diçînin, ku di piraniya caran de sedemine kesane ne, yan jî şaşiyine di ravekirina qonax û pêdiviyên wê de ne“.

Axaftin derbarê mamoste Ismaîl Umer gelek e, lê ji me tê xwestin, ku em bi kurtî hin xebatên wî bînin bîra we.

Bi rawêjkariya wî pênc hejmar ji kovara Gelawêj (Cara yekê di dîroka rojnamgeriya kurdî de li Sûriyê) bi çapeke lihevhatî û spehî derketin. Herwiha mûçe (meaş) ji kesên kal, yên ku nikarin kar bikin û gelek malbatên ku xwediyên wan ne amade bûn, mizaxtin. Her demê piştgiriya semîner û hevdîtinên rewşenbîrî dikir û piştevaniya folklor û komên folklorî jî dikir, ji bo çalakirina tevgera wêjeyî û hunerî ya kurdî li Sûriyê. Herwiha çapkirina dîwan û pirtûkên gelek wêjevan û

helbestvanan danî ser milê xwe û gelek ahingên xelatkirina wan li dar xistin, ji ber ku wî dizanî bû, ku ev ahing dê hestên wêjevanan bilindtir bikin û bibin sedemên afirandin û deranîna gelek berhem û pirtûkên din. Herwiha mamoste yek ji wan kesên pêşî bû, ku xwest dîroka tevgera kurdî li Sûriyê bê nivîsandin û hêvî ji nemir Mihemedê Mele Ehmedê Tûj kir, ku bi vî karê pîroz rabe.

Heger di wê demê de hinek kes ji kar û xebata wî ne razî bûn, sedema wê jî ew bû, ku wan kesan nêrîn, bîr û boçûn û helwestên mamoste Ismaîl şaş fêm dikirin, ji ber hebûna wî di wê demê zû bû. Ew kurê serdemeke pêşketîtir bû.

Mamoste li gorî hevalên xwe yên partiyê xortekî nûhatî û piçûk bû, lê dikarî bû rêza xwe li ser hemû havalan ferz bike, yên ku ew çavên wan de xortekî çalak û biceger bû, ku tu carî bêhêvî ne dibû û ji bêhêvîtiya rewşa kurdî ya wê demê re serê xwe danexist. Em dikarin bi kurtî rewşa kurdî ya wê demê bînin bîra we:

Girtina sekretêrê partiyê (El Partî) û komek ji endamên serkirdayetiyê.

Pêkanîna projeya kembera erebî ya nijadperest.

Têkçûna şoreşa kurdî li başûrê Kurdistanê, ji ber pêkanîna peymana Cezayir di sala 1975-ê de.

Parçebûna partiyê di sala 1975-ê de û pûçbûna piraniya rêxistinên wê.

Van sedema tevî ew bêhêvî ne kir û karî bû hevalên xwe bixe wê baweriyê de, ku pêwîstî bi kongirekî lezgîn ji partiyê re heye.

Di sala 1977-ê de kongirê didoyê yê partiyê li dar ket û mamoste Ismaîl roleke sereke û girîng di biryarên wî de lîst.

Di sala 1979-ê de mamoste endamê komîteya navçeyî ya El Partî di herêma El Cezîrê de bû, ku ji kesên sereke bû, yên ku biryara komîteya navendî ne pejirand, ya ku sedema kêmbûna têkiliyan bi Partiya Demokrat a Kurdistanê-Iraq re bi hebûna şepêleke rasterew ve di serkirdayetiya El Partî de girê da bû. Mamoste hişt, ku gelek hevalên partiyê li dijî vê biryarê derkevin.

Di sala 1984-ê de kongirê çarê yê partiyê li dar ket û careke din mamoste bû endamê komîteya navendî û nivîsgeha siyasî.

Di sala 1988-ê de di kongirê giştî yê partiyê de helwest û nêrîna heval Ismaîl bi awayekî xurt hatin pejirandin, ku di encamê de komîteya navendî ji wê biryara xwe vegeriya. Wî di kongirê de ne xwest xwe bike berbijêr û digot: „ Ez li ku bim, dikarim rajekariya partiya xwe bikim“. Lê ji ber ku gelek hevalan hêvî jê kir, wî jî daxwaza wan erê kir û di encamê de dengên hemû

beşdaran wergirt û bû endamê komîteya navendî û herwiha endamê nivîsgeha siyasî jî di partiyê de.

Têkoşer Ismaîl Umer roleke xurt di avakirina hevbendiya di navbera sê partiyan de (Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê-El Partî, Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê û Partiya Hevgirtina Gel li Sûriyê) lîst, ku cara yekê di dîroka tevgera kurdî de li Sûriyê bû û navê wê bû Hevbendiya Kurdî li Sûriyê.

Bi vê yekê heval Ismaîl xemekî xwe yê giran û armanceke xwe ya bilind di çarçewekirina tevgera kurdî de li Sûriyê pêk anî û bi awayekî xurt li gel hevalên xwe bernameya hevbendiyê û tûzika wê amade kirin, ku ji aliyê hersê partiyan ve hate erêkirin. Vê yekê kêfa miletê kurd pir anî û hêvî xurtir kirin, ku tevgera kurdî bibe yekdest bo bicihkirina mafên gelê kurd li Sûriyê.

Lê gelê kurd bawer ne dikir, ku piştî du salan nakokî bikevin komîteya navendî ya El Partî de. Ev nakokiyên derbarê hevbendiya kurdî li Sûriyê man heya kongirê pêncê yê partiyê di sala 1987-ê de, ku tê de nêrînên mamosteyê nemir Kemal Derwîş û Ismaîl Umer bûne cihê giftûgoyê û di encamê de biryar hate standin, ku rê ji her partiyê re heye, ku derbasî hevbendiyê bibe, heger ev partî bernameya hevbendiyê li ser xwe bipejirîne û li gorî wê kar bike. Lê piştî kongireyê bi demeke kurt, ku hilbijartinên komîteyên partiyê li gorî tozikê pêk hatin, encama wê ne li gorî texmînên mamoste Kemal û gelek

endamên komîteya navendî bû, lewre jî pir aciz bûn û mamoste Ismaîl Umer bi avakirina komikan bi alîkariya hin endamên bingehîn di partiyê de tewanbar kirin. Di encamê me hevalê Ismaîl Umer û Salih Umer ji kar hatin rawestandin. Vê yekê hişt nakokiyên El Partî gurtir bibin û di encamê de mamoste Ismaîl Umer di gel hin hevalên komîteya navendî û gelek hevalên bingehên partiyê yên sala 1984-ê neçar man, ku kongirekî awarte di sala 1988-ê li dar bixin û navê partiyê bû Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê- El Partî-Beşê Ismaîl Emo. Komîteya navendî ya vê partiyê piçûk bû, ji ber xwe amade dikir, ku hin yekîtiyan di gel partiyine din pêk bîne. Piştî vî kongirî bi demeke kurt têkilî bi Partiya Kar a Demokrat li Sûriyê û hin hevalên bingehên Partiya Çep re hatin kirin û bi kongirekî yekîtiyane hate xemilandin, ku di encamê de di sala 1990-î de Partiya Demokar a Kurd a Yekbûyî li Sûriyê hate damezirandin û komîteyeke navendî ji hersê partiyan hate hilbijartin û heval Ismaîl Umer weke sekretêrê wê hate hilbijartin. Helbet ev gav di cihê xwe de ne ma û têkilî bi Partiya Karmendan (Şexîlê) û Partiya Hevgirtina Gel re ji bo yekîtiyeke nû berdewam bûn.

Têkoşer Ismaîl Umer bi xwepêşandeke mezin li gundê Mamela yê girêdayî navçeya Efrînê rabû, ku tê de bêtirî 20 hezar welatiyê kurd beşdar bû, ji ber ku hevalê partiyê mamoste Ebdil Hemîd Zîbarî bi destê hin hêzên terorîst hatibû kuştin. Mamoste Ismaîl di wê xwepêşandana dîrokî de axaftineke pir balkêş got. Em wê jî tînin bîra we: „Riya rizgarîkirina bakurê Kurdistanê dê ne di ser

laşên Kurdên Sûriyê re derbas bibe û partiya ku karîbû li vî gundê piçûk 20 hezar mirovî  bide hev, dê karibe li Şamê bêtirî 50 hezarî bide hev“. Bi axaftina xwe ya navdar mamoste Ismaîl Umer nameyeke zelal ji wan kesên veşartî, rêjîma Sûriyê û hêzên wê yên ewlekariyê re şand.

Di sala 1992-ê de serkirdayetiya hevbeş hat sazkirin, ku tê de mamoste Ismaîl hin pêşniyazên girîng dan, da ku tevgera kurdî ji karê xwe yê klasîkî derkeve û bi şêwazekî têkoşerî û aştiyane bixebite. Biryar hate standin, ku dê belavokek bi helkeftina projeya serjimartina awarte ya 05.10.1962-ê, ku di encamê bi hezaran kurd ji nasnameya xwe bêpar man, bê belavkirin. Di encama vê çalakiyê de bi sedan hevalên partiyê hatin girtin û dadgehkirin û bi salan jî di zindanên Edra, Seydnaya û Şaxê Felestînê de bi azarî jiyana xwe borandin. Di dema dadgehkirina hevalên partiya de Bavê Şiyar jî beşdar dibû û destê xwe ji hevalan re bilind dikir û ji wan re teqez dikir, ku  partiyan wan dê wan bi tenê nehêle.

Di sala 1992-ê de mamoste Ismaîl Umer ji bo beşdarbûna kongirê Yekîtî Niştîmanî Kurdistan li Iraqê ji hêla partiyên kurdî ve hate hilbijartin, ku li wê derê gotinekê bi navê wan bixwîne. Piştî kongir jî serdana gelek partiyên kurdistanî kir û di serî de têkoşer Sadiq Şerefkendî, yê ku di wê demê de sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Îran bû. Herwiha di şerê

navxweyî yê Partî û Yekîtî de li Iraqê mamoste Ismaîl bi awayekî xurt li dij bû û timî digot, ku şerê kurdan bi kurdan dê tiştekî bi destêt me nexe û divê bê rawestandin. Ew di gel gelek hevalan her demê amade bû, ku lihevhatinekê di navbera herdu partiyan de pêk bîne. Ev helwesta wî bû cihê rêzê li ba herdu partiyên sererke li başûrê Kurdistanê, ku piştî lihevhatinê xwestin baştirîn pêwendiyan bi partiya Ismaîl Umer re girê bidin.

Di sala 1993-ê de kongirê yekîtiyane pêk hat, ku tê de Partiya Demokrat a Kurd a Yekbûyî li Sûriyê bi Partiya Karmendan û Hevgirtina Gel a Kurd re yekîtiyek pêk anî û navê partiyê bû Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê-Yekîtî.

Piştî kongir çalakiya belavkirina nameyekê derbarê serjimartina awarte li Sûriyê pêk hat û name li gelek mal, dikan û nivîsgehan hate belavkirin. Partiyên tevgera kurdî bi tevayî tev li vê çalakiyê bûn û partiya Yekîtî organîzetora vê çalakiyê bû. Di encamê de gelek heval û alîgirên partiyê hatin girtin.

Mixabin ev yekîtî piştî çend salan ji ber gelek nankokiyên kevn derbarê hevbendiyê têk çû. Hevalê Hesen Salih di gel hin hevalên din pêşniyaz kirin, ku divê partî xwe ji hevbendiyê vekişîne (Aliyê ku berê Hevgirtina Gel bû) û hin hevalên din jî li dijî vê pêşniyazê bûn (Aliyê Yekîtiya Demokrat).

Hevalê Ismaîl Umer gelek caran li ser pêwîstiya yekîtiya tevgera kurdî li Sûriyê tekez dikir û ji ber ku nav û dengê wî bi başî û qenciyê li asta partîtî û tevger kurdî belav bû bû, gelek kesan ew bi dabeşkirina partiyê tewanbar dikir, da ku dest ji karê xwe berde û êdî serê wan ji vê kesayetiya têkoşer û yekîtîxwaz vehese. Ji ber vê yekê xwestin, ku karê wî û hin hevalên din di serkirdayetiya partiyê de rawestînin.

Helbet di vê projeya yekîtiyê de bizaveke siyasî, çandî, ragihandinî û civakî bi awayekî fireh derket holê. Gelek kovar bi zimanê erebî û kurdî derketin û herwiha gelek poster û belavok li seranserî herêmên kurdî li Sûriyê û Kurdistanê hatin belavkirin.

Mamoste Ismaîl Umer ê yekê bû, ku xêza partiyê xiste riya rast de, ku Kurdên Sûriyê ne peyên tevgerên kurdistanî ne, lê belê xwedan dozeke rewa di hundurê Sûriyê de ne û berê tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê da Şama paytext, ji ber ku çareserkirina doza kurdî li Sûriyê li wê derê ye.

Ev çalakî bûn cihê balkêşî û kêfxweşiyê li ba gelê kurd li Sûriyê û baweriya gel bi tevgera wî siyasî bêtir anî û gelek kes ketin wê baweriyê de, ku karînên yekîtiya tevgera kurdî ne tiştekî zor e, nexasim ku mirovekî mîna mamoste Ismaîl Umer bi erkê wê radibe.

Heval Ismaîl Umer ne tenê partî kirin yek, lê belê her demê hewl dida, ku çarçeweyine gucav ji têkoşînên partiyên kurdî re bibîne û armanca wî ya mezin ew bû, ku lêvegereke kurd ji kongirekî niştîmanî kurd bê avakirin, ku tê de hemû partiyên kurd, çalakiyê civakî, rewşenbîrî, aborî û kesayetiyên serbixwe beşdar bin û bi hev re bibin hevparên avakirina biryara siyasî ya kurdî li Sûriyê.

Avakirina mala kurdî li Sûriyê cihekî baş di mejiyê mamoste Ismaîl de girtibû, ji ber ku ew gava sereke û bingehîn e, ji bo bicihkirina armancên gelê me Mamoste ji bîr ne kir, ku partî jî yek ji wan alavên têkoşînê ye, ji bo bidestxistina armancên gelê kurd li Sûriyê.

Bi vî awayî riya têkoşîna kurdî hate guhertin û xwepêşandan û mangirtinên hevbeş ên kurdî û demokrat li Sûriyê li kolan û meydanên Şam û Helebê pir bûn. Di piraniya caran de heval Ismaîl Umer ji sedên beşdaran ji nav ereb û kurdan ve dihate hilbijartin, da ku nûnertiya mangirtiyan bike, ku xwestekên wan bigihîne rayedaran. Vî karê têkoşerî hişt, ku nêzîkahiyek di navbera Ismaîl Umer, partiya wî û tevger kurdî ji aliyekî û hêzên niştîmanî û demokrat, rêxistinên civaka şarewer û komeleyên mafên mirov li Sûriyê û gelek hêmanên gelê Sûriyê ji aliyekî din ve çê bibe. Di encamê de gelek semîner û yaneyên giftogoyê li dar ketin, ku li dawiyê daxuyaniya damezirandina Dandezana Şamê di sala 2005-ê de derket, ku tê de Kombûna Niştîmanî ya Demokrat, Hevbendiya Demokrat a Kurdî, Eniya

Demokrat a Kurdî û nûnerine ji rêxistinên civaka şarwer, komeleyên mafên mirov û Tevger Aşûrî û hin partiyên niştîmanî li Sûriyê beşdar bûn.

Ev ked û têkoşîna heval Ismaîl ew gihandi bû baweriyekê, ku divê têkoşîna niştîmanî ya kurdî bi ya niştîmanî ya demokrat ya sûrî re di heman demê de berdewam be û dûrî hev neçe. Heval Ismaîl di gelek çalakiyên Danezana Şamê de beşdar dibû û amadekarî dikir, da ku kongirekî niştîmanî li dar bikeve. Tevî ku bi tundî rexne ji hêla partiyên siyasî yên kurdî ve lê dihatin kirin, ew li ser nêrîna xwe dima û pesend dikir, ku helwesta wî ya siyasî dirust e, ji ber ku wê helwestê hişt, ku stûnek ji stûnên rêjîma Sûriyê bikeve. Ew stûna ku her demê dixwest gelê kurd û tevgera wî ya siyasî ji tevgera demokrat li Sûriyê dûr bixe.

Her demê digot, ku têkoşîna gelê kurd li Sûriyê dê erkê me derbarê gelê me yê kurd li parçeyên Kurdistanê yên din ji bîra me nebe. Her demê têkilî bi partiyên kurdistanî re dikirin û pesend dikir, ku şerê birakujî û nakokiyên kurdî-kurdî dê tiştekî ji gelê me re bi dest nexin.

Herwiha ji wan helwestên wî yên pîroz piştgiriya partiyên bakurê Kurdistanê bû. Dema ku endamên wan di sala 1980-yî de ji ber artêşa Tirkiyê penaberî Sûriyê bûn, ji wan re tekez dikir, ku kurdên binxetê û di serî de hevalên partiya wî dê pariyên nanê xwe bi biraderên xwe yên serxetî re parve bikin. Herwiha di gel partiyên din

xebitî, ku roja bombekirina bajarê Helepçeyê bibe rojeke xemgîn li ba gelê kurd li Sûriyê û ev helwesta wî bû biryar û salane jî heya aniha bîranîna Helepçeyê pêk tê.

Herwiha di 16.02.2007-ê dema sekretêrê partiyê Mihyedîn Şêx Alî hatibû girtin, mamoste Ismaîl dora 30 hezar kes li bajarê Efrînê kom kir, da pêşwaziya sekretêrê partiyê bikin û li wir gotûbêjeke xurt û balkêş got: Dostino, hevalino xelkê me yê hêja, em zor we spas dikin û pîroz jî dikin, ji bo azadiya hevalê me Şêx Alî, sekretêrê partiya me. Ji ber hevalê Şêx Alî ne girtiyê malbata xwe bû û ne tenê girtiyê partiya xwe ye, hevalê Şêx Alî girtiyê doza we bû, hevalê Şêx Alî girtiyê tevgera kurdî tevî bû, hevalê Şêx Alî girtiyê tevgera demokratî sûrî bû, hevalê Şêx Alî girtiyê peyva azad bû û hevalê Şêx Alî girtiyê mafên wenda bû. Dîsa pîroz be li we vegera hevalê me Şêx Alî, dîsa vegeriya nav we, vegeriya nav hevalê xwe, ewê piyê xwe bide piyê hevalê xwe di Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê de. Wê piyên xwe bide piyên hevalê di tevger kurdî û tevgera niştîmanî li Sûriyê. Emê tev de bi hevdu re bixebitin, ji bo welatekî demokrat, ku xelkê me mafê xwe tê de peyda bike, mafê wî yê netewî, çi rêzanî, çandî û civakî, ku di vî welatê demokrat de doza kurdî çareser bibe. Ez dixazim bibêjim zindan ne cihê miletê me ye. Miletê me cihê jiyaneke xweş e. Cihê wî wekhevî ye, cihê wî bigihe mafên xwe, cihê şirîk be, beşdar be li Sûriyê. Sûrî welatê me teva ye, welatê kurd û ereb û netewên din e. Bi girtinê doza me çareser nabe, doza me çareser dibe bi dan û standinê. Ev

doz wê bimîne li erdê, wê girtî timî hebin û nîşana xebatê bin. Miletek bêje ez xebatê dikim, divê girtî hebin. Hevalê Şêx Alî wê ne yê yekê be û ne yê dawî be. Heya mafê me nekeve destê me, wê timî girtî hebin. Wê xebata me berdewam be. Tecrubê isbat kiriye, ku bi girtin û zindanê xebata me ne sekiniye û nasekine. Wê xebata me berdewam be, heya ku miletê me çarak ji doza wî re bê dîtin, heya miletê me nûnerek jê re bê dîtin û venasîn bi nûnerên wî bê kirin, doza wî çareser bibe, mafê wî peyda bibe. Rêjîm bi hevalê me Şêx Alî re xesirî (bi ser ne ket), bi girtin wî armancên xwe bi dest ne xist, xwestin bi girtina hevalê me Şêx Alî hevalên me bitirsînin, nameyekê ji tevgera kurdî û ya demokratî sûrî re rê kin, lê ew name ne giha cihê xwe. Xwestin rola partiya me bisekinîn, rola wê, tevgera wê xebata wê, ji bo lêvegereke kurdî, ji bo pêşketina Daxuyaniya Şamê, ew name ez dîsa dibêjim ne giha cihê xwe. Miletê me, hevalên me xebata xwe zêde kirin, bi girtina hevalê me Şêx Alî tevgera kurdî bêtir nêzîkî hevdu bû. Tevaya partiyên kurd cihê spasiyê ne, ku tev bi hev re li pişt hevalê me Şêx Alî sekinîn û li pişt doza xwe sekinîn, û li pişt doza demokrasiyê sekinîn. Spasî ji bo tevgera niştîmanî demokratî, bi dehan komele û rêxistin, ku tev li pişt hevalê me sekinîn, ku ji bo berdana wî daxuyanî derxistin, bi hezaran xelk piştgir bûn. Dîsa spas ji we re. Spas ji xebata we re. Wê xebata me berdewam be, heta em bigihin mafê xwe û dîsa spas ji we re û seheta we xweş be.

Rêbaz û xêza siyasî ya têkoşer Ismaîl Umer, keda wî di rajekariya gelê kurd de û herwiha xebata wî bi hêzên niştîmanî û demokrat li Sûriyê, ji bo bicihkirina armancên hevbeş ji bo bidestxistina demokrasî, wekhevî û dadmendiya civakî, rêza gelê kurd û gelê Sûriyê bi tevayî bi dest xist, ku hemû bi koçbarkirina wî di 18.10.2010-ê de seyr û mat man. Ew rêza mezin jê re di beşdariya dehên hezaran ji welatiyên Sûriyê (kurd, ereb û aşûrî ûwd) di rêwresmên binaxkirina wî de di 19.10.2010-ê de li gundê Qerequyê diyar bû, û herwiha di behîdariyên ku li gelek bajarên Europî û erebî pêk hatin. Herwiha ew rêza mezin jê re di lehiya birûsk û nameyên behîdariyê de, yên ku gihan partiya wî û vê dawiyê jî di çilrojiya wî de, xuya bû. Ev beşdarbûna fireh ji hemû şaxên bizava demokrat li Sûriyê cihê rêz û hurmeta tevger, malbat, heval, hezdar û partiya wî ye.

Wergera ji erebî: Meksîm Îsa

# Beşê Kurdî

Birîna demê



Abdisemed Mehmûd (Bavê helbest)

Herdem tê hebe namire

Venamire dîroka te

Li ser tîp û pirsa kurdî

Jîndar dimîne navê te

Rêbaza te her li pêş be

Bilind dimîne doza te

Sûnda mezin em dixwînin

Erk bişopinin rêka te

Doza ku daxwaz li dû be

Ew tu car nemaye li jêr

Mafê tû jêre xwedî be

Di xemile bi neqşê zêr

Şagirtên te perwer de ne

Bawerî cergê dilêr

Li ser kêla te bikolin

Mezara her kurdê bi kêr

Ka serî rake meyzeke

Li vê şapê li vî banî

Em civînekê çê bikin

Bi zarê melê û xanî

Hûr hûr ji mer şiroveke

Civata seyda berzanî

Limêjê xwedan li wa bin

Qazî û şêxê pîranî

Qamişlo 19/10/2010

Venamire dîroka te ?



Abdisemed Mehmûd (Bavê helbest)

Di helkefta koçbarkirina mamoste yê nemir û tekoşer de BAVÊ ŞIYAR Ismail Umer serokê Partiya yekîtî a demuqrat a kurd li sûryê bi dehan nivîsandin li ser hatine nvîsandin û weşandin, lêkolîn, gotar ,helbest, pexşane, behîname, bi tevahî li ser siciyên wî yê paye bilind rawestyane , rola wî ya giring di tevgera kurdî de ne tenê di nava partiya xwe de lê di tevahiya tevgera kurdi bi taybetî û di tegera niştimanî sûrî de bi giştî beşdariya mezin di rêûresmê veşartina wî de, û di rojên behiyê de, bi sedan kesayetiyê navdar ji birayê me yên Ereb , Asûrî ,xelkê menî yêzîdiyan, eşkere dikir ku ev kesyetî awarte bû di nav tevgera kurdî de, ez nayêm wan sinciyan dûbare nakim , lê dixwazim yên nehatine gotin bêjim ango ew tabyet bûn tenê kesên nêzî wî zanîbûn , ew mêrxasiya wî ya kesayetî, di sala 1973 an de di şerê çirya pêşîn de, yê ku di navbera sûryê û israil de çêbû , bavê şiyar tê de beşdar bû , serbazê(mûlazim) bêlûkek

leşker bû **(siriyekê**) dema êrîşeke dijmin mezin hate wan bi zanebûn û mêrxasiya xwe endamên xwe tev ji kuştinê rizgar kirin , tu kes ji endamê bêlûka wî ne hatin dîlkirin û ne kuştin , li ba erkanê leşkerê sûrî nave wî pakrewan hate tomar kirin , ew bilind kirin **bi paya mûlazimê yekmîn,** piştî eşkere jî bû ko saxe ne pakrewane ma biritba xwe ya nû wek xelatkirinekê ji erkan bo mêrxasiya wî.

Mêrxasiya wî di karê rêxistinê de hemberî desthilatê mezin bû bi sedê caran berpirsiyarê şaxên esayişa di riya kesên xwe re jê re dişandin ger tû newe ba me emê te bigrin , te winda bikin , te pir bêşînin . lê bersiva wî yek bû beryare li ba me em narin ba wan kengî ez grtim bila min bigrin .

Ji bilî van mêrxasiyeke din li ba bû ko dema xwe di dît şaş digot û eşkere dikir ez şaş çûme yan şaş têde gihiştim , li ba wî gelekî mezin bû ko dilê kesî bihêle , ta wan kesên ko ne wek hev raman dibûn di konevaniyê de

Di vê bûneya mezi de ku bi ser me de hat , ko dostek, hevalek, birak ji me stand , zimanê min lal di be . peyvên min hev nagirin tenê xwezî min karîba li gor asta lehengiya te , helbestekê diyarî giyanê te kim

Abdisemed Memûd ( Bavê helbest

**Qamişlo 28/10/2010**

## Apo Cimo

Mêvanên hêja,

Dostên berrêz,

Wekî gencekî, xortekî ku li Roava bûye û mezin bûye, pirr bextewar û şanaz bûm ku min Apê Îsme'îlê 'Emo nas kir. Heval û dostêm albatame bû; lê ew hevaltî û ew dostanî ya baweriyekê bû, a dozekê bû, ya gelê Kurd bû.

Win zanin ku em Roavayî, em Ewrupî, ên ku li vir bûnî, çi Fransiz bin, çi Alman bin, çi Belcîkî bin, çi Îngilîz bin, pirsên mîna doza gelê Kurd bi me sêr û 'ecêb in ; çima çareser nabin ? Çito Kurd bi huner, dîrok û kar û mezin û rêberên xwe yek ji xwediyê Rohilat in, û çito Kurd di vê rewşê de hatine hîştin ? Em Kurdên Ewrupî jî êdî li bersiva van pirsan digerin.

Di wê gerrê de, em çûne Qamişlo, bûne mêvanê Apê Îsme'îlê 'Emo, di mala wî de, li ser mînderê û doşekê, me hevdî nas kir. Piştî demekê, Apê Îsme'îlê 'Emo kete pêş me û em çûne seredana Gorna Cegerxwîn. Paşê, em û Apê Îsme'îlê 'Emo û Apê Nezîr Mustefa berî ku bi keve nav kerwanê pêşmerge û Nemirên Kurd, li ciyekî, bi hev re, rûniştin.

Bi rastî, ez jî wek Kurdekî Firansiz, wek xortekî Kurmanc, ji xwe di pirsim : çawa Rohilat di rewşeka malkambax de ye û çawa zana û jîr û rêberên mîna Apê Îsme’îlê ‘Emo şiyar in, bi ceger in, bi dil in, bi çav in, karin li hember Qedera malkambax rabin ? Ev yeka me xortên Kurd ên Ewrupî hên han dide, hên zana dike, hên çava vedike.

Bila serê miletê me sax be.

Parîs, 30.10.2010

**Arya Cimo**

**Ala Rengîn**

Çend gotin ji *Ala Rengîn* a Osman Sebrî

Min divê her tu bilind bî

Ala Rengîn Kesk û Zer

Him xweşî, him ceng û rûmet

Tên zanîn ji sor û gewr

Dûr, nêzîkez ê te hildim

Tu yîxemlabanê min

Ger bi vêdermanmirinbî

Bo te gorîcanê min

Li pêşsuhna te bûneax

Leşkerênşerxwez, lek bi lek

Herçîxort in, herçîKurd in

Bo te lawjandibêjin

Leşkerimbo te, Ala min


Min divêgurmîn û şer

HemîKurdbo tebûnepandî

Çi Rohilatî, çi Roavayî, bi huner

Parîs, 30.10.2010

Qehremanî bi navê te dest pê dike



Bavê Helebçe

Hêvî û gaziya min ji yezdanê dilovan ku pênûsa min bi min re alîkar be ta ku gotara min bi rêk pêk be û layqî bejna vî lahingê paye bilind be .Bi rastî bûyer pir giran bû û ji min û pênûsê mestir bû, lê mefer ji bazdanê tune ye . Gelek zindî li vê jînê bê rawanin lê cendek mirî hîn serkêş in bi kerwan in .

Qamişlokê reş girêda xortên ciwan jar û mest in.

Bilbilê malik wêran hela wer bike fîxan.

Konê reş wa xwiya kir hey hewar.

Koç kir serokê min.

koçerê min çû germiyana hiştin vala zozanê min.

nema êdî tê guhê min dengê kewê gozel.

nema xweş dibin civat û şevbihêkên min.

lê na tu carî tu ji dil nabî cuda tê her bimînî.

di hiş û ramanên min de serok û rêberê min.

hey hey qehremanê miletê kurd tuwî yek ji wan kesên ku wê her û her di hiş û ramanê gelê xwe de bimînî serok û serkêşê kerwanê zindiyan.

gelo wê çawa jiyan bê te berdewam bike .jiyan bê te tehl û zilindar e .Lê ji bo ku jiyan berdewam be gereke em te di bin zimanê xwe de bi meyînin.

te di landika zarokên Helebçe û Xormal de bilorînin.

xweska serokê min, min karîba ez te di reşika çavên xwe de veşêrim.

bi mijangê çavan te ji germ û seqema xuristê biparêzim.

Erê serokê min, min nizanîbûku ezê ewqasî bêriya goristana gundê qereqwa xopan bikim .Her pêşemb çavnêrya min bike, ez têm serdana gora te û kêstekên dora gornê diguvêşim, da ku dengê nalîna dilê min û ahîna keserên bêrîkirinê bê guhê te û tu wan ji xwe re bikî belîf heta pêncşemeke din.

Rihetbe bazê min... Mêrxasî, qehremanî ,dilsozî û welatparêzî bi navê te dest pê dikin.Tucarî pişta te xwîz nabe çiyako.

Bazê min, di roja 18- 10. 2010 an de keskesor di bejn û bala te ya payebilind de der bû,  me di wê rojê de hêvî û armancên xwe ji Yezdan re kirin xelat. Lê ci bikim, wê rojê bazê min bi çengê şikestî bi ser min de hat.!!

Lê çi bikim ku cîhan li serê min û bazê min bû taca roj hilat. Lê bazê min, di rojê de mirin û jiyan bi hev re kirin raperîn û xebat.

Erê bazê min, tu bi hemî şêweyên kar û xebatê beşdar bû bo parastina nasnameya gelê xwe. Wê ew kar û xebata te ya bê rawestan bibe pirtûkeke pîroz, rê li pêşya xortan bo pêkanîna jiyanek azad û aştiyane ronî û dûz bike .wê navê te rûpelên dîrokê bi tîpên zêrîn bixemilîne,

lê mixabin mûma geş zû vedimre û gula ciwan jî bihara wê kurte û qeyika hêviyan zû ji perava jiyanê bar dike.Lê na, ma heta kengî ey feleka bextreş, ev çend û çend ji te re, vê carê te li serî da!! . Ezê vê xencera xwe ya sû kirî di gurçika mirinê de biçikînim, da ku hestên menî şikestî careke din ronî û geş bibin.

Rihet raze bazê min, soz û peyman emê heta dawî rêka te bişopînin, emê bê rawestan kar û xebatê di ber wê doza te ya dadmen û rewa  ya ku kula wê bi te re çû gorê bikin.

Rihet raze serokê min, bawerî bi van hevalên li şûn te pir bilind û xurte  ku wê bi hişmendî û zanistî rahêjin barê te.

Rihet raze, bere hemî gulên vî welatî ji bo te bikin dîlan gulek bi tenê ji rengê hestên te bibe bawername di rojên cejn û şahiyan de xort û keçên kurda singa xwe pê bixemilînin.

Rihet raze, tu mêvanê Berzanî û Seyid Riza û Qadî û Nûredin Zaza û  Şîx seîd î.

Rihet raze bazê min, tu payebilind hatî jînê, bi rûmet û payebilid çûyî!!.

Bila cihê te buhişta rengîn be!.

11:11:2010

**Ji rêberê gelê Kurd bavê Şiyar re**




**Dilawerê ZENGÎ**

Diyarî ji bo giyanê pêşewayê gelê Kurd nemir Bavê Şiyar re pêşkêş dikin û bejna xwe li ber gora wî ya pîroz ditewînim.


Ey mirin,
Ey mirina reş,
Ey mirina bê bext û ol,
Ey narevîna xiniz û sergerîn,
Ey feleka bê zik û pişt,
Bi pencên xwe yî rewrewkî,
Bi bejna xwe yî xapînok,
Te konê reş li ezmanê me vegirt,
Heyv ji ezmana hilweşand,
Stêr û Gelawêj te herifand..

Siyasetvan û rêberan rê winda kirin,
Rewşenbîr û zana nivîsên xwe çirandin
Ronakbîran pênûsên xwe şikandin
Bûk û zeriyan rondikên xwe barandin
Dê û bavan şîn gerandin
Zemîn hejî, perî govend gerandin
Li me hejaran serî gerandin
Şev reş û tarî, pişt li me şikandin
Ka rêberê me, ka ew qehreman
Zû ji nav me barkir gihaye kerwan
Kerwanê nemiran wa ye li rê ye
Hevalê Ismaîl rêberê rê ye,
Digel Zaza, Hemze û Osman,
Civînê deyne rêberê Kurdan,
bangê bide Tîrêj û Cegerxwîn,
Keleş û Bêbuhar, seydayê Namî,
Gel tev şiyar e, lê dil birîn in,
Ji çûna we tevan ew dilbixwîn in,
Heyfa li wê heyfê ko hîn bibînin,
Şûna şêran kund lê bixwînin.
Ey mirin
Rast e, te ew ji nav me bir,
Ji ber çavan te ew winda kir,
Lê bi sûnd, bi soz û peyman
Bi kêla ber serê pakrewanên Qamişlo
Bi gora pakrewanên sînema Amûdê
Bi Laleşa Nûranî..
Bi gora vî pakrewanî

Tê nikaribî bîrûbawerîyên wî
Raman û ramyariya wî
Ji hişê me derîne
Tê nikaribî hezkirina wî
Ji dil û canê me derxîne
Ey mirina bê bext û ol..

21.10.2010

Ey mirin





Dilawerê ZENGÎ

Diyarî ji bo giyanê pêşewayê gelê Kurd nemir Bavê Şiyar re pêşkêş dikim û bejna xwe li ber gora wî ya pîroz ditewînim.
Ey mirin,
Ey mirina reş,
Ey mirina bê bext û ol,
Ey narevîna xiniz û sergerîn,
Ey feleka bê zik û pişt,
Bi pencên xwe yî rewrewkî,
Bi bejna xwe yî xapînok,
Te konê reş li ezmanê me vegirt,
Heyv ji ezmana hilweşand,
Stêr û Gelawêj te herifand..
Siyasetvan û rêberan rê winda kirin,
Rewşenbîr û zana nivîsên xwe çirandin
Ronakbîran pênûsênxwe şikandin
Bûk û zeriyan rondikên xwe barandin

Dê û bavan şîn gerandin
Zemîn hejî, perî govend gerandin
Li me hejaran serî gerandin
Şev reş û tarî, pişt li me şikandin
Ka rêberê me, ka ew qehreman
Zû ji nav me barkir gihaye kerwan
Kerwanê nemiran wa ye li rê ye
Hevalê Ismaîl rêberê rê ye,
Digel Zaza, Hemze û Osman,
Civînê deyne rêberê Kurdan,
bangê bide Tîrêj û Cegerxwîn,
Keleş û Bêbuhar, seydayê Namî,
Gel tev şiyar e, lê dil birîn in,
Ji çûna we tevan ew dilbixwîn in,
Heyfa li wê heyfê ko hîn bibînin,
Şûna şêran kund lê bixwînin.
Ey mirin
Rast e, te ew ji nav me bir,
Ji ber çavan te ew winda kir,
Lê bi sûnd, bi soz û peyman
Bi kêla ber serê pakrewanên Qamişlo
Bi gora pakrewanên sînema Amûdê
Bi Laleşa Nûranî..
Bi gora vî pakrewanî
Tê nikaribî bîrûbawerîyên wî
Raman û ramyariya wî
Ji hişê me derîne
Tê nikaribî hezkirina wî

Ji dil û canê me derxîne
Ey mirina bê bext û ol..

Bavê Şiyar.. Namirî!



Dilawerê ZENGÎ

Kî serok û rêber e?
Bavê Şiyar serwer e
Taca zêrîn li ser e
Kes nîne li hember e
Tev de bêjin: Namirî
Pêşewa û serwerî
Him serok û rêberî

Namirî tu namirî

Qehreman û rêzan î
Perwer û torevanî
Rêça xebatê danî
Wek serokê Barzanî

Kêr nekir zilm û zorê
Serbilind çûye gorê
Ala wî tim li jorê
Xort û keç tev li dorê
Bavê Şiyar zindî ye
Navê wî sermedî ye
Şûna wî tim li cî ye
Partiya Yekîtî ye
Kî bibêje: Newa ye
Peyva dijmin li ba ye
Zikreşiyê rê da ye
Nokerî lê rewa ye.

19/10/2010 Qereqoy/ Dirbêsiyê.

Koça reş



Ekrem tehlo

Diyarî rewnê têkoşerê nemir İsmaîl umer.

Sirûda girî di gewriya

Sibehê de lalbûye,

Sînga rojê ji keseran tengbûye,

Ji dêrikê ta efrînê

Alên reş libadibin

Cardî li warê me çi bûye,

Ev çi bahoze li cihê

Lûsa me rabûye,

Dîsa mirina zik reş

Çirayeke netewî vemirand

Kanîka danê miçiqand

Gula stêrka rijand,

Ey mirina bê dem û soz

Ma qey pencên te na weşin

Diranên te na herifin

Şûrê te kohna be,

Ho hevaloooo...

Stûn a konê kurdayetî

Hêza damarên yekîtî

Ristvanê

Tevna birayetî,

Bi çûn a te re

Kenê birînê azirî

Bihar a xewna kizirî

Bend û bizmik

Li devê pênûsan zîvirî,

Ho serkêş....

Sozdar û xemkêş

Ji kuve dest pêbikim

Mixabin, destpêkê

Barkir,

Li ku bi dawî bibim

Piştî te dawî azad kir,

Dûmahî

Liser oxira xwe belavkir,

Erê bavê şiyar....

Rêwi yê riya dijwar

Mamosta yê pêdar,

Bellllêêêê

Xweş mêr û hestyar,

Te koçbarkir

Şeva kurda mest û menge

Rê pir dûr û tenge

Hîna zûbû........

Berbang a roniyê derenge,

Ho pêşeng....

Çav û zimanê  hejara

Zingilê doza sitembara,

Dijminê sitem kariyê

sîperê azadiyê

Bilbilê mirovatiyê,

Ger tu xewnek ba

Emê di xewda lite

Bigeryana,

Ger tu rngkek ba

Meyê te ji keskesorê

Bistendana,

Yan tu rêwiyek ba

Emê li duryanekê

Pêrgî hevbana,

Çi bêjim...

Îro rojeke bi şane

Pir girane

Pesindariya lehengan

Ne tiştekî hêsane,

Ne çîroke

Ne helbeste

Ne romane,

Pêvajo ya xebata te

Bi xwe dasîtana

Rêça te şopand

Ji bo me dibistane

Bîr û baweriyên te

Tovê te çand

Çare û dermane

Xewn û armanca te

Li ser milane

Keda şagirtan

Li karistane

De razê

Bê xem razê....

Rêberê hişmend û dilgerm

Xwedanê ramana nerm,

Cihê te xuyaye

Pir cudaye

Li nav rûpelên dîrok

Çendî bibûrin sal û dem

Tê bimîne

Her tê bimîne....

Lêveger û kok.

Rêberê rênas



Heyder Omer

*Ev gotin ji hêla Heyder Omer ve, roja 28. 11. 2010 li Bajarê Herne /Elmanya, di rêwresmên çelrojiya Ismaîl Omer de, bêamadekirina* pêşî, bi her du zimanên *kurdî û erebî, hate gotin.*

Îro çel roj di ser koça dawî ya dost û birayekî payebilind û siyasetmedarekî jêhatî re têper dibin. Çel roj di hesab jiyanê û mirinê de demeke gelek kurt e, nikare şîna dilan û derûnan bide alîkî, û rondikan bimale. Di rewş û pergaleke welê de , k u hest de stlatdar û serdest in, pêdiviya a xiftinê b i z imanê r aman û l ogîkê heye, ge l

mirovekî wek min, ku havîbûnê ewa vetiye quncikekî teng, ji welêt, xizim, dost û hogiran bidûrxistiye, û hestiyên wî dihêre; mirovekî ku rewşa wî wusa ye, dê çawa karibe zimanê hestan û yê raman û logîkê ji hevdu veqetîne?! Lê tevî vê jî ezê hewl bidim, û tenê li ba sê xalan rawestim.

Xala yekem: Hatiye gotin, ku mêranî û qehremanî ne ew e, ku mirov her tiştê dixwaze, di jiyana xwe de pêk bîne û bi dest xîne, belê mêranî û qehremanî ew e, ku mirov ramanekê ji xwe re peyda bike, pê bawer bike û ta dawiya jiyana xwe ji bo wê ramanê bixebite.

Li gor ritme û pînanên vê gotinê, Ismaîl Omer temriya mêraniyê û qehremaniyê li destên xwe digerîne, ji ber ku ewî ramana xwe diyar kir, û ta roja dawî dest jê berneda, û her tim, li dirêjiya çel salî ji bo wê ramanê xebitî.

Xala duwem: Karê min wek mamoste li dirêjiya bêtirî sî û pênc salan ez hîn kirim, ku sînorkirin (nîşankirin) û numabûna armancan yekemîn mercê serkeftina her tiştekî, her karekî ye, ji ber ku sînorkirin û numabûna armancan di kare bibe alîkarê te, da tu alavên pêkanîn û bidestxistina wan armancan bi hêsanî û zanebûn vebjêre.

Îsamîl Omer armanca xwe bi awayê numa nîşan kir, ku ji bo mafên vî gelê ku hema bi kêmanî heya îro, tehliyên jiyanê, ne şêriyên jiyanê, vexweriyê, dixebite, û çareseriya doza wî jî li Şamê; paytexta Sûriyê dibîne. Vê

lomê jî şûna xwe, wek kes, wek partîzan, wek serokê partiyê, wek endamekî tevgera kurdî li Sûriyê, şûna xwe û ya pa rtiya xw e û ya t evgera kur dî d i na v r efê demikratên sûrî, bi nûnertiya ragihandina Şamê de dibîne.

Xala s êyem: L ihevkirina got in û ki rinan: E ger got in û kirin li he vdu ne banin, û be rgeh t êkevin na vbera w an, karînên xe batê j ar di bin, j i hê z di kevin, û he r ç iqas ev bergeh f ireh û mezin bi be, e wqas j î ge lek ka rînên milatan û kesan di wê bergehê werdibin, û ji hêz dikevin.

Her ke sê, ku l i I smaîl O mer guha dar bûye , a n hi nek j i nivîsên w î xwendine, a n j î he vpeyvînên w î bi hîstine û xwendine, jê re zelal xuya bûye, ku gotin û liv û tevgera wî gav bi gav bi hev re bûne, li hevdû dibanin.

Ismaîl Omer, li gor van xalan, hêjaye ku w ek rêvebirê rê naskirî were nîşankirin, ku wî riya xwe nas kir, û bi zanebûn li ser wê riyê diçû.

Vê lomê, koça wî ya zû û ji nişkave, ne tenê ji bo partî û gelê wî, belê ji bo tevahiya tevgera demikrata Sûrî ziyana mezin e . H êvîdar im, ku pa rtiya wî û t evgera kur dî l i Sûriyê û tevgera de mikrata S ûrî, valahiya ku koç a w î peyda kirî, zû dagirin.

Sipas

Nayêne jibîrkirin



Keça Kurd

Stêra xebatkarekî dî ji asmanê welatê me, asmanê Qamişloka serhildanê bi ronahiya xwe a geş verija ser zeviya xebatê û hêdî hêdî vemirî. Mixabin xebatgêrê birûmet mamosta Ismaîl Umer(Emo)bê amadekarî û bê xatirxwestin ji nav hejêkiriyên xwe, ji nav dost û havalên xwe koçkir, koçberiyeke bê veger. Mirin li ser me hemiyan qanûneke rewaye, lê, xwezîka jiyê mirovên birûmet, xebatgêr û hêja dirêj bibiwa, da bihtir karînên xwe ji civaka xwe re bi kar bianiyane. Lê, dîse ez dibêjim, mirovên bi rûmet, mirovên ku ji dil û can ji bo gelê xwe xebitîne, namirin; bîr û baweriyên wan, nav û

helwestên wan di wijdanê gelê wan de bi rêzlêgirtin dimînin, wan kesan bi xwêhdana westa xwe, çira paşerojê pir kirine, êdî bi hêza tu ba û bahozan navemire; her wê pêketî bimîne.

Ez mamosta Ismaîl ji nêzîkî sih salî ve nas dikim, bêguman di riya xebat û tevgera neteweyî re me hev naskiriye û di vê riyê de dostanî çêbûye. Ji sala 1984an ve ez û birayê xwe Berzo di kovara Gelawêj de dixebitîn. Ev kovar partiya ku wê demê mamosta Kemal serokê wê bû derdixist. Çûn û hatina mamosta li gel hevalên wî li mala me hebû, nemaze dema ku pirsgirêkên dijwar di nav partiyê de rûdan û bi mamosta Kemal re ketin astengan, giha astekî  ku, nema dikarîn bihev re bixebitin. Bi vî rengî parçebûnê dest pê kir. Wê demê jî malbata min; ango zaruwên xalê min, birayê min Berzo hemî li gel mamosta Ismaîl cuda bûn. Li gel ku ez ne di rêza partiyê de jî bûm lê min û Berzo me kovara Gelawêj guheste rexê wan. Mihemed jî li aliyê wan bû,  rastî bi wan re didît. Vê yekê jî bihtir hêz da dostaniya me. Li wê demê hevalên benda dî, Mihemed gunehbar jî kirin, digotin ku wî hiştiye ev parçebûn rûbide..Lê a rast Mihemed ti peywendiya Mihemed bi vê parçebûnê nebû.

Bi vê têkiliya me a dostanî, min mamosta naskiriye ku ew mirovekî xwedî rûmet û gelek bi rêz bûye. Mirovekî li hember herkesî nerm û xwediyê peyva xweş bûye.  Bi hêminî, bi dengekî nivz û bi bêhnferehî diaxivî. Di ruwê hevalê xwe de germ  nedibû û peyva hişk nedigot. Ji ber

vê yekê jî her kesî rêz lê

digirt. Ev raya hemî wan kesên ku bi mamosta ra danûstandin

kirine. Xwendevanên xwendegehan, yên ku li rex mamostayî xwendine, pesnê wî didin û dibêjin,  bi gelemperî çi Kurd, Fileh û Ereb hemiyan rêz li mamostayî digirtin û bi hejêkirina  bavekî lê dinêrin. Xendekareke wî li ser rûdawekê diaxive; çend heftiyekê mamosta xwe ji ber dezgehên parastin nependî dike û nayête xwendegehê. Lê dema ku mamosta li rojekê vedigere û qutabiyên wî li qata jor wî dibînin, hemî bi hev re dilîlênin û jêre li çepkan didin.

Ji rastiyan mirov dikare bêje ku, mercên serokatî û yên serdariyê di kesayetiya mamosta Ismaîl de hebûn, ango cihê xwe dadigirt.

Ez dixwazim rastiyekê ji we re bêjim, ew jî ew e, ku mamosta Îsmaîl û mamosta Salih Omer handarên serekî bûn û wan bihêvîkirin berê Mihemedê mele Ehmed dane nivîsîna dîroka partî li parçê binxetê. Li sala 1986an rojekê mamosta Îsmaîl û mamosta Salih hatin mala me, ji Mihemed xwestin ku qunaxa pêşî ji dîroka partiya dîmuqrata kurdistan li Sûriyê binivîse. Wê demê hêşte Mihemed dest binivîsînê nekiri bû. Mihemed bersiva wan bi nerênî da, bi mehaneya ku tiştekî nivîskî di destên wî de nîne û demeke dirêj bi ser ve çûye, rûdaw nayêne

bîrê..Lê van du camêran dane pey Mihemed û li daxwaza xwe sist nebûn. Digotin tu di nav hemî rûdawan de bûyî, dubendiya di girtîgehê de rûdayî dîse tu di nav de bûyî. Û digotin , tu cihê baweriyê yî, em ji te dixwazin ku ji nifşên bê re tu rastiya wê serdemê binivîsî. Paş çend carên ku hatine mala me û her car jî daxwaza xwe dubare dikirin; dev jê neberdan ta ku Mihemed daxwaza wan pejirand û dest bi nivîsînê kir. Bi vî rengî Mihemed dîroka partî  nivîsî û di pey re jî pirtûkên dî... Ango ez dixwazim bêjim ku ev jî berhemek ji rengê xebata bi rastî û dilovaniya mamosta Îsmaîl e.  Bîrlêkirina wî di vê daxwazê de, rastiya xebata wî belî dike û wî dizanî ku bil ji Mihemed wê kesî dî nikaribe bi vî karî rabe, an jî baweriya wî bi kesî dî nebûye. Mirovên weke van herdu mamostayan dê bimînin duhnê li çira nifşên paşerojê.

Em bi van kesan re bin an jî em li dij wan bin, navê gelekan  ji wan, dikeve dîroka tevgera kurdî de, ji ber ku ew xwediyê vê dîroka pîroz in, wan bi xebat û tevgera xwe  dîmenê vê dîrokê neqişandine. Ew kesên li cara pêşî bîr lê kirine,  rêxistinekê, an jî partiyekê damezrênin, da ku gelê xwe ji bin zordariyê rizgar kin û herweha nifşê di pey wan re jî ku bi dehên salan,  di vê riyê de kar kirine , dê bimînin sax û ew nayêne jibîrkirin. Di baweriya min de mamosta Îsmaîl jî yek ji wan pêşengan e ku saline dirêj ji bo gelê xwe xebitiye, navê wî dê bikeve dîroka pîrozî gelê  wî de.

23.10.2010

**Komîta Dicla ya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî**
**Xêzên zêrîn bê dawî man**

Careke din, Qedera xapoker û Mirina reş setema xwe li ser tevaya miletê Sûriyê, nexasim li ser miletê Kurd, bikar anîn û Mamosteyê hêja û nemir ***Bavê Şiyar*** ji nav me dizîn. Belê, koçbarkirina mamosteyê me ziyaneke pir mezin û bi êş bû ji civaka Sûriyê re. Gernase ne ew kesê merov wî mezin bibînê, lê belê yê mezin ew e ku merov xwe bibînê gernas di civata wî de. Nemir ***Bavê Şiyar*** yek bû ji wan kesên ku merov xwe di civata wan de mezin didît.

Nemir ***Bavê Şiyar*** di rabûn û rûniştinên xwe de mamoste bû. Çendî hebûna wî bi me re kêfxweşî bû wiha jî windabûna wî ji ber çavên me xemgîniyke giran e. Ew ne tenê rêber û rêzan bû, lê belê ew mamoste bû di dilovanî, dilsozî û dilpakiya xwe de, û li gel vê jî, di kesnasî û mirovnasiyê de jî ew bi xwe mamosteyekî pir jîr û dûrmeyzên bû. Nemir ***Bavê Şiyar*** mamoste bû di hizir, raman, û baweriyên xwe de, mamoste bû di têkoşîn û xebata xwe de, û di têkildariyê de, çi bi hevalên xwe re

û çi bi dost û hogirên xwe re. Ango, nemir ***Bavê Şiyar*** mamoste bû di tevaya jiyana xwe de. Ne tenê di jiyana xwe de, lê belê di anijyanbûna ( mirin ) xwe de jî ***nemir*** mamoste bû çûnkî wî hemwelatiyên rengereng, ji hemî bajar û bajarokan, û ji hemî parêzgehên Sûriyê, li hev civandin çi li ser gora xwe û çi di bin konê behiyê de.

Nemir ***Bavê Şiyar*** xemxwerê doza welatparêziyê, wekû ya miletê xwe yê Kurd bû. Her weha nemir ***Bavê Şiyar*** xebata xwe berdewam kir ne ji bo partiya xwe, lê belê ji bo yekîtiya xebata tevgera Kurdî, û ji aliyê dî ve jî xebata tevgera welatparêz û welatperwer. di sala 1990 î de cara yekemîn bû ku yekîtiyek - heger teng bû jî, lê gava pêşî bû - di nav tevgera Kurdî de hate damezirandin. Ev yekîtî bû weke xwepêşindanekê ne tenê di hundirê tevgera Kurdî de, lê seranserî tevgera welatparêz di Sûriyê de. Gava didiwan yekîtiya sala 1992 ê bû û ya sisiyan damezirandina Danezana Şamê bû. Hêjayî gotinê ye em vê jî bêjin : Nemir ***Bavê Şiyar*** xebateke bê rawestan di şopand li ser riya avakirinina Lêvegereke Kurdî ku bibê hêlîn ji kar û xebata her kesekî Kurd î neteweparêz û welatparêz, çi serbixwe bin yan ji rêxistinên siyasî bin, ji ber ku doza miletê Kurd ne ya tevgera siyasî tenê ye, lê Kurd hemî xwedî parin di vê dozê de her wekû çawa hevpariya wan qet ne kêmtir e di kêşandina zor, setem û îçkencê de.

Belê, rûpel û lênûs tên dagirtin û pênûs di westin lê qet dil bi nivîsandinê hînik nabin û na vehisin, çunkî jiyana

nemir ***Bavê Şiyar*** ne bi salên temenê wî di hate pîvan, lê belê bi kar û xebata wî, bi hizr û ramanên wî û bi dûrbîniya wî di hate pîvan. Jiyana ***Bavê Şiyar*** qet ne qonaxek ji dîrokê bû, lê ***Bavê Şiyar*** bi xwe dîrok bû. Lê sed mixabin, ew xêzên zêrîn ku nemir ***Bavê Şiyar*** nivîsandin bê dawî man. Em hêvî dikin hevalên nemir ***Bavê Şiyar*** berdewam bikin ji bo bi dawîkirina van xêzên zêrîn.


Nemir ***Bavê Şiyar*** ne tenê di rêvebiriya xwe de kesekî gewre bû, lê belê di warê çand û guhdanê li zimanê zikmakî dîse mamostekî gewr û berze bû .

Li ber çava ye karên hêja yên ku mamoste gavên fereh di wan de dabûn, eger em wefadar bin ji vî karî re, giringe ku merov van xalan bidê xuyakirin û jibîr nekê. Piştgiriya kovar û weşanên bi zimanê dê li cem nemir ***Bavê Şiyar*** ciyekî pir girîng di girt. ne tenê Gelawêj nîşana karê wî yê gewre bû di ber zimanê dê de, lê belê Perwan, Newroz û Pirs berdewamiya vî karî bûn.

Ji ber ku di baweriyên nemir ***Bavê Şiyar*** de, zimanê dê bi roleke giring radibe di hebûn pêşveçûna gelan de, ewî gaveke pêşketîtir avêt bi damezrandina Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê û piştgiriya wê, bê dudilî, dikir.

Awazên latekê di şîna welatperwerekî de..

*Diyarî giyanê nemir Îsmaîl Ûmer*



Lewend Dalînî

Dengvedana koçkirinate,
Di nav lêvên latekê
Ji ên Kepezê Kîkan de
Zîz dihat, brûskek da
Û keserek kûr
Di bim simê zemên de

Kişand???!!!

Û serê xwe
Di şîneke kûr
Û bi mitale  de
Tewand
Bi awazekî kelogirînî
Xwe vewejand


Û ber bi asîmana ve
Diçû
Û li şar û şaristanan
Bela dibû

Bi dengbihîstina wî awazî re
Çil beybûn
Bi rê ketin
Çar sînor derbaskirin
Û li goristên
Xwe bin xak kirin
Berî dema xwe,
Şîn bûn,
Katdan,
Pişkivîn,
Û bûne gul…..
Dehan Xwe kesk kirin
Dehan Xwe sor kirin
Dehan Xwe spi kirin
Û dehan jî Xwe zer kirin
Lê tuwan xew reş nekir????????!!!!!!!!!!!
Li giyanê mêvanê pakrewan
Xwe pêçan
Ber bi asîman ve bilind bilind
Rêstin
Û dîlanek danîn
Stêrkan jî xwe nêzî hev kirin

Ji wan re li çepikan dan
Û bûne xêlîvan
Ber bi bûhişta Narîn

*Şam Çirya Paşî 2010*

Mamoste Ismaîl Umer




M.E.Heso

Min ji pirsê dipirsî bi zanîn min di zanî

Rêwiyê rêka dirêj

qet darê xwe dananî

Ji bîr nakim ti carî

ka bavê Şiyar kanî ?

Comerdî , bêhna fireh

te tevde ji kû , anî !

Ti carî na herife

ew esasê te danî

Jîr û aştîxwaz bû

wek Îsayê noranî

Ziman zan û rêber bû

navdarê vî zemanmî

Ti kesî qet ne tewand

quloçê vî beranî

Dîrok te ji bîr nake

tu ma şagirtê Xanî

Ew dê zêde pîroze

çog da erdê , tu anî

Qamişlo reş girêde

felek bextê te kanî

Eyobê kurma xwarî

te rêçek nû danî

Çi evînek bi rûmet

evîna Kurdistanî

Bimre kesê tirsonek

patoxwirê erzanî

Tiştê ku hatiye dest

keda xwîn û xwêdanî

Karê te berxwedan bû

rengê mezdik û manî

Em rêça te bernadin

da neçike ev kanî

Sitêrek me hate xwar

hate xwarê ji banî

Tu bû her ê dev li ken

Bedîê Hemezanî

Ew partîzanê hêja

xwendin , yekîtî danî

Millet piçûk û mezin

behwerî bi te anî

Tu bû kaniya Ferat

qet na çike ev kanî

Lehengê jîr û çalak

bû şagirtê Berzanî

Rengê Sîpan û Codî

tê bimînî  li banî

Peyxenberê bindestan

nebiyê vî zemanî

Bimre kesê tirsonek

tirsonekan çi anî

Jin û mêr şiyar kirin


bimre bimre nezanî

Te soza xwe bir serî

rêberê vî karwanî

**18-10-2010**

Kurd ji malzaroka xemgîniyan afirîne
Di helkefta koçkirina Mamosta Simaîl Umer de.



Mihemedê Seyid Husên

Nxwe ku ava çemê evra diherike, dê hêsirên zeriyên tîtal zaravekî taybet rave bikin, li cîhana miriyan berjewendiyên hevpar û ciyewaz li gel eydiyolojiyên nakokîbar gotebêj nabin.

Karxezala beriya Mêrdînê, raznameyekêdi nava girdikên keziyên xwe de bi têrûtesel hûnaye, li ser kolînka nermebayê hêwa bo nemirê gewre hinatriye, lê dexsokiya qiralê rewanbirr di hinavên wî de bûye komer, û hezker ji hêrsa newaziyên dil, aramî û tenahiya pakrewan bûne yekber.

Qedera xapînok û fermana qiralê kêmewle, ew pêşewayê xweş rewişt û pêşzan, dûrbîn û bîrciwan, zarçêjer û gernejîna pêşiwar, guhdarê gelekî rêzdar, xest hêmen û fêrisê ferezan/***Simaîl Umer***/ ji nêv xizm, heval

û hogirên wî revandiye, mixabin mîna baqê nîvco rewanê pakzayî, dilsoz û nemekdarê kurdayetiyê, hevkarê kar neryan, û awira giştî, bê wext û paxav giyanê wî mist kiriye, hîç rê nedayê ku temêniya xwe, erk û egersezayên xwe bo nifşên nûhatî ta bi derzî vekî, rola perwerdeya ziman bo heman nifşê hemdemî li serdema çerxê 21 ê û xwezyarên qûnaxa hestiyar, armanc, mebest û bernameyên tekoşînê di kar û xebatê de, bi yek zimanî radestî celebên şûnşopa xwe bikî, nemaze ku li gora guherînên cihanî, tiknolojiya pêşketî, şoreşa ragihandina birûskî, bo ku xwezane û pêşbîniyên xwe di pêşewatiyeke yekgirtî de li pêşerojê sertac bikî, û ji navkutka cemawir çarçuveya pêşewatiyê, di rêga hilbijartina azad û dîmuqrat de destguhêz bibe û berdewam rêbaz bikî.

Li virê pirseke balkêş ji xweber dipengize holê: gelo piştî koça gorbihuştî ***Simaîl Umer*** Sekretêrê partiya Yekîtî Dîmuqratî ya Kurdî li Sûriyê, heye ku lixêvên rasteqîna mirinê li ramanên Serokatiya tevgera kurdî ya siyasî bi giştî bixurice, ji dil û can bicixire û bi dilbarî zixt û zewrên dexsînê bide wan ku berhevdehatinekê çêbikin, li xwe hişyar bibin û bi giringî niwêneriya dîrokî li gel dar û destekarên xwe hilgirin, û biryara ku miletê Kurd ji 45 salan ve çavdêriya wê dike berya mirinekê bidin, nemaze ku heman berateya zîvarî û destêwerdana karbidestên ewlekarî jê dûr bikin, ji nû ve li şûnwarên tevgera pereçe-werçe, ya tarûmar,

binemayên tevgereke yekgirtî bi yek ziman û yek gotara siyasî, guftûgoya birayetiyê di nav xwe de rêbaz bikin, xwe ji şert û mercên seqa dijheviya navxweyî bi yekcarî dawişînin, bi ser ve jî sedem û tilammên paşdemayînê, nemaze ku dîroka perçebûnê dirêj dikin ji binî ve destebirr bikin.

Mixabin neweku me gengeşaya êvara ku xwedê jê xweş çûye dilovaniya xwe bihîztiye, nemaze ku hêj gorbihuştî bi avegermê nehatiye şûştin û bi kefen jî nehatiye rapêçan, Eşîra wî ji temara xewa giran çit rabûye ser tapana, û ji nûve guh li bûneweriya xwe ya qeliyayî miç kiriye, û di encamê de yekser pêşinyar di biryara netewî de ji destê siyasetvan wergirt û destelatdarî lê kiriye, û Konê şînenîgeriyê ji Qamişloka girevtar raguhêztine gundekî dûrî destan, di çaxê ku em Kurd îro bi du tiştan xwe gelekî şanaz û bextewar dipesinînin. 1- rola Eşîrê di civakê de zêde kêmpeyda ye, li şûna wî silogan û diruşmên tekoşîna netewî rêberiya civakê dike, bi ser ve jî bîr û baweriyên kurdeyetiyê Eşîr tevlî rêzikên xwe yên paşverû binax kirine. 2- dîsanê weku me li pêş amaje pê daye, Kurd gihaye baweriyekê ku ji wê ezmûneya dîrokdirêj, nemaze ku Olê gelek ziyan gihandiye milet û ew ji doz û daxwaznameyên wî yên netewî dûr hiştiye, raberî heman paşdemayînê ji serdema çerxên 20 an ve Kurd li xwe hay bûne, û bi dilbarî rex û rê li ber tundrewiya olî girtine, bi say bizava ronakbîr û çalakiyên partîzan rol û

bandora olê di civaka Kurdî de serbêş kirine, bi wateya ku ol baweriyeke cudaxwaze di rêvebiriya civakê de, tewer ku em çerxê 21 ê dijîn gerke tucar neyê ji bîr kirin.

Loma pêk ve dibêjim li xwe vegerin, kûr û dûr xûm bikin, hew li paş bizîvirin, ziq li pêş venerin, li civaka xwe vegerin, li kul û derdên wê guhdarî bikin, bala xwe bidinê asteya zanistî û ronakbîriyê di civaka kurdî de baş bilind bûye, di her malê de Ekadîmîsyon çêbûne, deskeftên tiknolojiya pêşketî hiştiye ku her rewşenbîrek li ser rûpelê Enternêtê, karibe kêra partiyekê bo bergiriya gireft û kêşeyên gelê Kurd bike, hişê xwe vegerînin serê xwe karê çandî û siyasî, rewşenbîrî û aborînasîn ne tenha weke berya 50 salî yê partiyê û partîzane, qey hûn di xwe de baş ne ramiyane, we pêşeroja kêşeya gelê xwe li ser terezûya rasteqînê baş ne nirxandiye û dirustir nexwendiye, hûn dê çawa heman sipardeya pêşgotî ya perçe-werçe raspêrin nifşên nûhatî, qey hûn tê de neponijîne ku ev berbat û felaketên paşdemayînê tev ji destê perçebûnê, giyanê helperestî, xwedbînî û berjewendiyên tekakesane û paşkokên ramanên paşverû yên hozperestî hatine serê me, we bal nekişandiye ser celebên ku sipardeya /emaneta/ zîvarî ji we radest bike, wê çawa tîşik, pîne û tixarîsên ku we di nexşeya rêxistinê de çap kirine bibşifînin, weku nemir ***Simaîl Umer*** bi helkefta koça xwe ya dawî em li vê bûgînê hişyar kirine, û para xwe di sipardeyê de jî

sipartiy me/we yê mayî, mixabin ew negiha ku sipardeyeke /tevgereke/ yekgirtî bispêre nifşên nûhatî, ta ku ew ji ezmûneya we û xwe heman sipardeya hevgirtî, li gora xweztekên qûnaxê, pêşbînî û ezweriyên gelê xwe di çarçuveyeke yekgirtî de biparêzin.

Wek nimûne bala min kişandiye, xwedê jê xweş hozanê mezin dîroknasê Kurd ***Mihemed Emîn Zekî***. ku di çend ristên helbestiyane û kêşesaz de temêniya wa dibêje: û xweztiye ku li ser kêla mêrav wî bêtin nîvisandin, eger ku mirinê pencên xwe li min rapêçan, û hêj min çavên xwe serbilid bi azadiya gelê xwe kil nekiribe, hinga xweş bizanin dê giyanê min tanî roja paşdawî di gorê de binale, lê eger ku ciwanên Kurd bixwazin giyanê min di bergorê de hêmen û kamîran bivesihe, bela ji navkutka tekoşînê tucar dûr neçin.

Dema ku çemê tî diçe ku deryayê gerden bike, mîna evîndarê şeyda bizavê dike ku xwe bigihîne yara xoşewîst, weku qad jî nikare ji ser rûyê gerdûnê, dêm û dîmenên hezînê rêş bike, wisa jî volkan û oqyanos tucar nikarin vîna evîndaran daqurtînin.

Belê evîndare û hest dibe ku dilê wî hawar dike çavên şîlove, diya pakrewanê Qamişlo tîne bîra wî, û xweş dizane kata civanê evra bi heman ciwanan re, mîna navkutka dilê wî yê birîndar seraqet lê dixîne, em tev diçin heman civanê ku navê wî li ser zimanê mine, û henasên rûyê wî li ber çavên mine.

Erê kekê ***Simaîl***: dar û devî, çem û çyan xwe ji

kaniyên pesaran dadiwerêvin, co û cobaran di rûhinarkên lat û zinaran de vedikin, ne li hiş xwe li ser te digirîm, li peravên asîmana li ser pira cinafatê xayiz dimeşim, weku hin caran fîxana peyvên dapîran, ji nihurîna şahdamarên dil derdibin, û mîna perî û firişteyên bihuştê li asîmana di ser serê me re dirêsin.

Çak têgihame keko ku hin caran mirov dibe giraw û goriyê paknewaziyên xwe, û li serbêşa helwestên jiyanê tewşedînî û polîpoşman li ser xwe diponije, lê dema ku tu bi bişkovê re di gernijî, wê yekser mîna lêvên xatûna sorgulî di pêşwaziya te de geş vedibû.

Bê guman ji dîroka berbatê, ji keftelefta bendemanê, ji rencekêşana dîroka kêferatê, min naskiriye ku Kurd ji malzaroka xemgîniyan afiriye, lewra di helkefta koçkirina Mamosta ***Simaîl Umer*** de, Sekretêrê Partiya Yekîtiya dîmuqratî ya Kurdî, mîn derfeteke keysenzêrîn bo xwe wergirtiye, tenha ku li gel kûraya şîna giran, gencîneya kul û derdên xwe/we yên şevnivistî û dîrokdirêj li ber xwênerê xoşewîst vala bikim.

Ji berbanga ku jiyan li ser rûyê gerdonê peyda bûye, û yezdanê xweristê yê yekpare behremî hemî zindîwaran û dezgeyên zendegî kiriye, mirov di hîletekî ewarte de, lihevhatî, keşxe û bê hempa afirandiye, ji hinga ve evîn û mirin hevparî hemî hêlekarên jiyana mriovan û hemî cûreyên şînkayî û texlîtên canewirên bej û avî bûye, lewra ji heman perensîpa jorgotî, min sîmboliya evînê ji bîr û boçûnên xwe, ji deng, reng û dîmenên xwerista

welat {Kurdistanê} ya dîlber û bihuştiyane gewde kiriye, û ji têgeha ku evîn ji kînê, dexsokî û çavnebariyê cudaxwaze, herweku kîn û evîn du alavên dijhev, ango berevaj yên erênî û neyênî, mîna av û agir hevbeş û pêvedarî yasayên gerdûnî bûne, êdî hevrikiya navxweyî li ser heman baweriya bineretî bo bidestxistina rasteqînê hêj berdewam maye.

Herwiha ji destegava ku civak di mirovaniyê de dabeş bûne, bi ziman û rengên xwe, bi çand û kultûra xwe, bi xaknîgariya xwe ya taybet, navnîşan û nasnameyên dîrokî bo wê pelge bûne, wisa jî miletê Kurd mîna miletên cîhanî di her pênc parzemînên gerdûnî de, xwedî ziman, çand û kultûreke taybete, û di rojhilata naverast de, li ser şaristaniyeke dêrîn û di nexşeyeke taybet de rûniştiye û pê jî hatiye nasîn.

Êca di bafîkê de bi rastî min tucar dil niye ku li ser hêmanên aşopî, ango daşûrî bi tûjrexneyên neyênî rahêjim lawên hemrahên xwe, lê mixabe ku coşa rasteqînê û nûxwazên qûnaxa hestiyar, em pir pêdivî rexneyeke derlayen û zanava kirine, û xemxuriya ku serwayên tevgera siyasî û rewşenbîrî di bin bandora perensîpên eydiyolojiya totalîtarî û yekraweya tekdestelatdariyê de, şêwejiyana civaka kurdî xistine tengezariya paşdemayînê, nemaze ku rewş û pergala gelemşe ya bê sermiyan hiştiye, ku kesên helperest û rastîveşêr, wan kesên rastgo di civakê de gunehkar bikin, û xwezyarên berhevdehatin û yekgirtinê bo mafên

rewa û egerseza piştguh bikin, wisa xayiz û bê serî xwe noq bûne genava dijheviya navxweyî, û ji eniya tekoşînê li hemberî dagîrkerên noker û xure rex dane ji destxweçûnê, lewra hêviya min her ewe ku li pêşewayên civakê guhdarî bikin, hinga teqez dê ala yekgirtinê bête hildan û hemwarî guhertinên dadperwerdeyî yên siyasî, çandî û karûbarê dîmuqrqtî û aştiyane bibin, dê hemî gireft û kêşeyan li ser zîlana hevbendî û hevpeymanî bêtin rêbaz kirin, bê perwa û paxav, ji xwebawer û piştrast dê destelatdariyê li rûmet û viyana xwe ya bê nakokîbar bikin.

***Gereke mirov bihur qam bike.***

Giyanê gorbihuştî diaxivînim***:*** hîç ne ji reşbîniyan bi te re diaxivim keko, çiku reşbînî xwediyê xwe di genava bê hêviyan de teqlo-meqlo werdike, û bê hêvîbûn jî yar û xoşewîstan, çarenûs, gereft û kêşeyên giranbuha wenda dike, wisa jî çendî ku mirov hez ji welatê xwe dike, ewqasî mirov mafê xwe di azadiyê de dinirxînî, lewra min xweş bawere bira ku dê gelaxavtin bi te re dirêj be.

Dema ku mirov di jiyanê de baş diponije û bi dilbarî lê vedikole, hinga berî her tiştî mirov li avê digere, û tirsa agir jî yekser mirov dihingivîne, ji ber ku av sîmboliya jiyanê bo afrîdeyan qelafet dike, û bi avê mirov tîna xwe dişikîne, bi lehiya heman avê û coşa heman evînê mirov agirê daristanan û cengên cîhanî yên mezin vedimirîne.

Vêca çêtire yê ku nizane avjeniyê bike, an ku jiyanyariyê li ser terezuya hezînê bike, bela nêzî avê nebe, an ku tengî evînê jî nebe, ji ber ku evîn û av du metodên berdewamiya jiyana aram û tenahiyêne, li ser rûyê xweristê ji pêkîna gerdûnê ve peya bûne, ji ber ku av û evîn şahdamarên jiyanê zindî û çalak dihêlin, hemî êş û derdan, pirsgirêk û çarenûsan derman dikin, herweku welatê me Kurdistan têr ave, çem û çiyaye, çar demsalên cudaxwaz tê re derbas dibin, perçakî xawer û şahlewend ji bihuştê gewde dike, li ser rûyê gogzemînê mîrzayê gerdûnê yê gewre çêkroxiya wê çeleng afirandiye, lewra dê li ber dadgeha roja paşdawî niştecîyên xwe mîna tewankarên xemsar sintaq bike, çima ku tanî çerxê 21 ê bi xak, ziman û gelepora xwe ve dîl û bindest maye, herweku em bi çavên serê xwe dibînin û bi guhên xwe dibhîzin, bi keftelefta rojane hay dibin ku rûmet û payeberziya Kurd û pêşiwariya wî di cîhanê de birîn bûye û hêj dibe, diz û çolaxên bedkar û kêmrewişt destelatdariyê li biryara bûneweriya me dikin, stukra mafnasî, dirustkarî û yasayên serwatî û binemayên destûrî li ser awazên rêjîmên dagîrker direqisin, piroseyên wekhevî û saziyên civaka şarewerî xaçebir zîvirandine, di ser hemî yasayên mirovanî, dadiyên komelayetî, ji derveyî binemayên zanistî ve, di ser hemî kêşeyên bineretî re qevaztine, herêm li evîna aştiyane teng kirine, kaniyên çeman tanî bi ava binê heft pêlên zemînê ziwa kirine, ji ber zekema gendeliya bê

sergoş û kiryarên finasgenî, hemî zindîwarên bej û avî li aziyê hiştine, ter û ziwa mîna Helebçeya nemir şewitandine, lê sed mixabe kekê ***Simaîl*** ku mirovek bi tena xwe nikare zixurekî ji cî bilivîne, herweku mirov di moxilê re ji çavên xwe pê ve nabîne, û hîç neraste ku ji serjimara melyonekê tenha mirovek xenêmayî û kamîran bijî.

Herwiha ezê çend dîmenên hestiyar, ji kevçika dilê xembar, raguhêzim ber destê xwendevanê xoşewîst, û ji xaweriya tîpên navê welat {Kurdistan} helbesta xwe ji dezî û avdeyên nexşeya xoşewîst, cîgehê zayîna xwe û nemir ***Simaîl Umer*** bihûnim.

***Zeradeştê Pêxember gotiye: gereke mirov bizavê bike, ta ku dijmin bike dost, noker bike xwedawend û xwekarnas, nezan wergerîne hozan.***

Xweş bawerim birayê ***Simaîl*** ku mirov li gel evînê dikare sînga xwe bide kelmên asê, ba û bahozên xurt, pêlên derya hêç, û gerdûnê bi giştî geşedar û çakbîntir wergerîne, behremendiya jiyanê bike buhareke rengîn, mehederî û mehrîvaniya mirovaniyê bike xweşbextî û lêboranî, çend xulekên evînê sezane ku mirov jiyanê buhatir binirxînî, dibe ku derya û gever bê binî bin, lê qet çênabe ku mirov bê amanc, arezû û evîn be, tanî bi canewir, tarawgehên berfireh û asoyên vala bi heyv û stêrkan re evînê dikin, îcarê jiyana ku mirov bo gireft û kêşe, bo diva û hemî hûrpîşên pirojeyên evênê ne azire, reha nehêjaye ku mirov lê bimînî, çêbûye ku carekê

mirov serê xwe ji bo hêzdariya mal xûz kiriye, lê qet çênebûye ku bîrdozên evînê yên mîna nemir ***Simaîl Umer*** ê kêşegir û namedar serê xwe ji kesî re biçimînin, ku ne le akama evînê bana, ***(biborînin ku peyva Evîn di gelaxavtina me de wateya hezîna welat sîmbol dike)*** çûk li ber tavsorka rojava venedigeriyane lûsên xwe, zaroka bi şîr li sîng û berê diya xwe pelendar nedibû, yasemînê bi xunavê re ahenga kenyanê li dar nedixist, ji yadîgarên dîrokê evsane çê nedibûn û jîndarî nedigiha giyanê pêşbîniyan, me herdiwan jî destaneya Mem û Zînê, Ferhad û Şêrînê sedbare nedixwend, mirin û jaiyanê hevdû garden nedikirin, çendên caran û salan em li ser bêganeya zarokên xwe, di sirgûn, mişextî û penaberiyê de giriyane, berxika eware ji keriyê pez tenha tîna maka xwe nasdikî, çima xwedê nenasên ku em Kurd ji evînê kêmpar kirine, akincîyên welêt hogirî himêza evînê nebûne, loma ji nû ve pûçpelên salên payîza temen rewa dibin, mîna êşnasekî dilsoz, hemî kul û derdên bê çare, ji ezmûneya dîrokdirêj derman dikî.

Evîna welat di bîr û baweriyên me de jiyan bi serê xwe ye, ango rêbiwarî jiyanê herwe geşedariyê diweşîne, şê ye ku evîn rewan di kevir de bilivîne, ku ne bi saya evînê be mirov nikare pêşbîniyên mandê ciwantir raçavî cîhaniyan bikî, ku nivîser ji dil û can hez nekî tucar behremendiya afirandinê lê nabe mêvan, pênûsa wî nikare rûpelê sipî ramûse, nikare wateya peyvê çaksaztir biderbirîne, eger ku seqa, qad û asîmana

bi kîmawiya kînê û dijheviya navxweyî lewitî bin, tucar teyrê Baz nikare li asoyan teqla fira xwe sînor bikî, nahêlin tekoşerên mîna ***Simaîl Umer*** ji lehenda şêran {Kurdistan} tîrdûmana çirayê bi birûskên çiraxan biguherin, û xwe aram raspêrin tenahiya çiyarêzan, ku em nehêlin zimanê rewanbêje rola evindarê dilsoz, bo yekgirtina rewşenbîr û siyasî rêwefermî bileyize, bi rêkûpêk zîvarên perçebûnê pîne li dûv pîne li ser binaxa evînî bidirû û gêçirme bikî, zexeliya biyanî û hevrikiya navxweyî paşax bikî, ziyanok û zêdekarên mîna Beko Ewanan, nehedana keysebaz û xwefiroşên derûnlawaz û kurtêlxuran ji hêmanên wê ve rêş bikin, tovê rêleç, çewtebîr û lewçeyan, devlok û dexsokên noker, gelac û tewşedînan biqelînin, ku mirov rê nede xameyar, wêjedost û ronakbîr, ku hemî kêşegirên namedar çekdariya pênûsê nekin, ku bo rêkeftinê hevbendî û hevpeymanan girê nedin, ku herdû hêzên pêşewa rêveberiya giştî rêbaz nekin, êdî binemayên bîrlêkirina xweşxaneyan, ku li ser lengerên yekgirtinê ava nebin, wê çawa serhaweyê nûguherîn û nûxwazên qûnaxê bêtin bi destxînin, û destegavên pêşeng bo yekgirtinê bêtin çesipandin.

Dibêjin kekê ***Simaîl*** dema ku nûzayî tê dinê, sînga dê tijî şîr dibe, û dema ku dimire hinga çavên dê tijî hêsir dibin, vêca ku wisa em weke berê paşdemayî tenha kayîna tembel û tiralan bikin, li ber dîwaran, li civat û mihrecanan, quretî û reşbîniyan çep û rast bifiroşin hev,

çarenûsan di genava zikreşiyê û çavtengiyê de bihêlin, hezkirina tuxmê xwe, netewa xwe, dîroka xwe, kul û derdên xwe ji bîr bikin, gornepaş û sixtekarên helperest xelatan li hev bi parvekin, dirustkar û karnasên pispor xemsar li serbêşan qeşmerî û devjenk li wan bibarin, ji bîr kirine ku giyanê bizavêr, evîndar û berxwedêrên mîna ***Simaîl Umer*** tucar bêhode naçin û jibîr nabin, lê belê mîna hemî ezmûneyên cîhanî, dê zindar di rûpelên zêrîn de rêzgirtî û rûmetdar bimînin.

Herwiha jiyan bi xwe nefretê dide qels û lawazan, bi taybetî yên bê havil û ji gurdketî, ewên ku nikarin serbestiyê li şahinşahiya zirsawêr û xewnên xwe yên kelevajî bikin, û yên mayî di sînga felaket û şapazan de jar, perîşan, bê kes û kar mane, û li nêv xirecira aloziyên jiyanê bê çare dijîn, mixabe ku herêm bi şêneyên xwe ve zemanekî tagirtî dijî, rûyê qadê qeymaxekî zingarî girtiye, kujer ji dadgehê aferîn û nîşanan werdigire, û dadgêr pir şanaze ku bi destên xwe bergoreke tarî ji kevokê re dikole.

Naxwe ku em hêj di mijara mirinyariyê de diaxivin, hêjayî gotinê ye ku stirana evînî li ser jina Kurd neyê jibîrkirin, çelengiya bejn û bala gurciya tîtal, xivşa xezalan, gula çênî di şengerojeke buharî de, li nêv baxên xwerista welêt, li gel qehremaniya gel û kargoriyên gewre yên bi navûdeng, nemaze ku sîmboliya jina Kurdî di kar û xebatê de destnîşan dike, hîn bêtir jî ku nîvê civakê dijmêre û mîna xaka pîtdan pir dilovan û

evînyare, di hemî hêlekarên jiyanê de dana wê zêmdare, herweku dê, jin, xûşk û tekoşiyare, hunermend û kevaniye, rêvebir û xameyare, dibistana perwerdeyîyê ye, rêhevala karker û cotyare, bizavêra welatparêze, milîtana serê zinare, çendî çalak û barbuhêre, rewanpak û nemekdare, rextê pişta pêşmerga ye, di hemî hûrpîşên jiyanê de pişikdare, bi yek carî wateya kînê rave nakî, helkefta birakujiyê tucar pesende nakî, demdar mîna gula bînmerdî, bo mûjde û mizgîniyên nûzayan xweş afrendiyare, di himêza xwerista kurdistanê de timî likare, peyrewiya niştemane, mêzaya berxwedan û şehadetê ye, jana îşkenceyê bi aramî xwariye, li ser sêdarcanê rewan qelen daye, qêlên dirindeyan bi xavî ew cûtine, li ber ritma qamçiyan dev li zimanê xwe kiriye, bê etlayî nefret daye dîrokê, bê hedn û tebat dest û mil daye mêr, da ku termê dîrokê raguhêze çerxê serkeftinê, loma dibêjin: şête, hişgêl û dîne, yê ku bibêje hêsir tenha bo mêzayê çêbûne, û desthilanîn û gernasî li ser eniya mêr tomar bûye, bi kurtî ne dûre nimûneya Leyla Qasim û Zîlanê, û bi hezaran weke wan şehîd ketine li meydanê, ji bo lehenda şêran cî û warê xoşewîst Kurdistanê. Ya ku nemir ***Simaîl Umer*** giyanê xwe behremî wê kiriye, û berya wî hemî leheng û bizavêrên navdar, nemaze ku giyanê xwe bo serxwebûn û azadiya wê gorî erzan danîne.

***Kuurdistan*** lehenda Şêraye: cîyê ku cara yekem roka xawer lê hilatiye, cîyê ku mirovaniya pêşeng jê gav

daye jiyanê, cîyê berf û baranê, cîyê şaneşîna çar demsalan, zivistan û havînê, payîza rengan û buharê, cîyê ku pêxemberan jê pêvedane şirûsê, jê navnîşan û rozname dane dîrokê, cîyê ku şaristaniya mirovaniya tarîperwer jê çav daye ronahiyê, cîyê ku bîna misk û mawerê jê baweşî gerdûnê bûye, cîyê ku gernejîna xweristê, deng û reng, seyr û dîmen jê vedane, cîyê ku li bin hetavên heyvê bi civanê dildaran sûnd xwariye, cîyê ku berbatê pistepist di guhên tofanê de kiriye, fermana keştiya Nûh ji hemecûriya zindîwaran, ji hemî texlîtên rewanan, cotê nêrza û mêzayan li bextê Cûdê civandiye, cîyê ku perwane û hemî balendeyan, perî û firişteyan li peravên bihuşta wî, jiyan û mirin berdêlî  hev kirine, lê sed mixabe kekê ***Simaîl*** ku îro li heman cîyî pîroz û bêrîn Kurd mîna reben, bêgane û biyaniyan bûne niştewarên serbêşan, dêwên xure yên çavbirçî, li gel hevpeymans sêkuçikî welat lê kirine Giwantanamoya mezin, xwîna miletê Kurd giraw û gorî dagîr kirine, nehiştine ku cîyekî rêzdar û aram di nêv rêjîma cîhanî ya nû de, bo xwe bigire û saman bike.

Ji dîroka hevgariyan ve keko, welat bi ser serê nîştecî de kafûyekûn û wêrane, cîyê ku keçkaniya wê li pêşdemê riswa bûye, cîyê ku xwediyê resen tê de biyanî tomar bûye, bi saxî tê de zindan û binax bûye, xwezî bi dilê ***Simaîl***ê bira ku bi heman xaka pîroz hatiye sipartin, di himêza heman cîyê evra de, nemaze ku çavbirçiyên bedkar rûmeta wê dizîne, welat bi qad û asîmanê xwe

ve, bi mirov, mal û mewdanên xwe ve, bi çand, ziman û Kultûra xwe ve, bi sinc, rewişt û gelepora xwe ve, li gel hemî rêzikên civakî li bazara xurt û qelsan bê meteh firotine, kevnetor û dîroka gelê me ji pêçanokan bişaftine, sêpila bav û kalan ji şûnwaran rêş kirine, cîyê ku min û kekê ***Simaîl*** dixwezt wêneyên xwe di çavên wê de bibînin, cîyê ku me Peyala Zergeşê ji sîng û berê wî vexwariye, cîyê ku min û wî zarotiya xwe lê bişîr vekriye, û li ber hilm û tîna wî bi delalî haş bûne, dê û bavên me omîdên xwe bi landikê re hejandine, cîyê ku radihêje yadîgarên qehremaniya hestiyên bav û kalan, cîyê ku dergûşa şaristaniyê ji zikê zemîna wê axiviye, ji nêv tertpêlkên vekolînan gencîneya kevneşopê, weke bîner û dîdevan raçavî mêjevan û arkolojiyên cîhanî kiriye.

Cîyê Hor û Lor û Someriyan, cîyê Sopar û Hewriyan, Şahinşahiya medya, Waşûkanî paytexta Mîtaniyan, û hemî malbendên Mezopotamiya, destaneya Mem û Zînê, sîmboliya Ferhad û Şêrînê, herdû ferzendeyên evînê, evîndariya meleyê Cezîrî, tundbawerî û dadperwerdeya Herîrî, netewperweriya Xanî, hêza helbesta Cegerxwîn, awazên sirûda Namî, jê re xweş dîdevan û pelgetirîn çavkanîne, cîyê ku gulîzar mîna temenkinê ***Simaîl***. lê bi kavişkî hatine quraftin, cîyê ku li sipîdeya hemî rojên gerdûnî qurix û gelawêj, herdû sitêrên rêya vegerê, şopa kadizan, komika sêwiyan rêberî û pêwaniya rêdûr û sergerdanan kiriye, û dola

kurdayetiyê mîna gorbihuştî, destegul bo xwe weke navnîşan pelge kiriye.

Erê keko ji destpêka toşê ve me destaneya welatê xwe di çar pişkan de xwendiye, me baş hewl daye ku perestgaha Laleş ji bîr nekin, mîna Zeradeştê pêxember ji navkutka dilê xwerista dîlber ya comerd, ji reng, deng û dîmenên xîn û xawer, ku zimanê tuxmê xwe afirandiye, evraya navê ***Kurdistanê*** di sincên firiştiyane de paraztiye, Kurdistan li ser lêvên me maye stiraneke xemkûr, maye hêsireke tewş li ser mijgulên çeşmeyan, soza civanê mirin û jiyanê me bi hev re daye, mîna çîçeka sorgulî dêm li ser keziyên kurmancî berdaye, li ber herikîna cobarên hêsiran, li nêv dehl û zeviyan li êmîşên çêjer bûne mêvanê xoşewîst, bûne xaleke xawer li jora tîpên navê welat çirax daye, û hêj li benda hewara welat, mane gaziyeke deng-girtî, lê herwe çakbîniya navê Kurdistan em kirine dîlê evînê, kirine yawirê heyvê, loma bi hemî zaravan me nefret dane bextê xwe yê likumî, li dermanê jana bê dengiyê em lekijîne, li poşmaniya xwe bûne pale, me êşa lêmikurhatinê bê îşkence kişandiye, li serê werîs di nava aloziyên girîşkî de geriyane, li dîrokê ji kûr û dûr pelendar bûne, me li ser eniya xwe çiraxa evsaneyan daniye, warê bihuştiyane li ser milê ewrên hêwa daniye, li ser zend û bendên xwe dîroka perçebûnê û birakujiyê dax kiriye, lê sipas ji dana yezdanê desthilanînê re, ku hewlên me bêhode neçûne bira wo, çiku çakbînî li şûna reşbîniyan

ji nû ve di nifşên nûhatî de bişkivîne.

Heweku ez jî dizanim dê rojekê cîhana gewrik li paş xwe bihêlim, hîn çaktir jî dinasim ku dê û bavê min, xizm, heval û hogir li ser min bigirîn, loma min ji mêj ve hêsirên xwe di malikên çavan de zindan kirine, çima ku min poşmanî bi texmînî rave kiriye, min gelekî bi derengî li sezayên serkeftinê pirsiye, û hêj min ji ezmûneya têçûnê jî tobe nekiriye, dîroka dirustakrên evîndar di pendê de berevaj xwendiye, îcarê ji bo ku felaketên kargorî neyên jibîrkirin, min destê ku radihêje pênûsê dax daye, dîsa çima ku jiyana bê evîn li deverê kêmpeydaye, tenayî û destberiya tiral û korhêviyan jana bê hempaye, lewra min ji torfelaqiya zirkonevanan hewl daye, ku li şasiwarê peyvê bigerim, padîşahê helbestê bi destekî radihêje pirtûkê, bi destê dinê hêsiran dimale, xunava kamîraniyê li hawîrdorê dibarîne, omîd û hêviyan sertac dike, wisa jî mîna jana kêlîkê û şahiya hevdîtinê li gel çerxê çepgeriyayî, lixêvên hestên afirandinê û stûbariyên giranbuha sipartine pênûsê, û birûsk di paş ewran de bi şermokî xwe vedişêrin.

Birano ku em li dor masa girover hogirî hev nebin, ji encama guftûgoya hevpesende ji hev danexun, bi yek destî li zengilê yekgirtinê nexînin, berjewendiyên xwe yên netewî li pêşiya hemî kêşeyan rêbaz nekin, mîna heyva ku çavên xwe li sitêrkan dişikînî, û tarîka şevê bi hev re dixemilînin û li hev dibanînin, êca ku silava kaniyê stirana dil awaz nekî, govaniya xwe li ser

pêçanokên dîrokê eşkere nebêje, bê tirs û paxav rasteqîna nasnameya xwe ji cîhaniyan re li ba nekî, bîrgeş tûjawiran nedin hemî gireft û kêşeyên mafrewa û erkseza, çima emê timî gunehên xwe bi hêsiran bişon, û hêj newazî ji dilên hemnijadên me li ser agirê hêtûnê diqiçqiçin, çima em bi dilbarî hewl nadin ku peyala şînenîgeriyê nema vexun, koromîdên baskokirî li ber ronîka melûl tew rave nekin, pêşçare û pêşinyaran bi hûrbînî, li ser serada hûr werbêj bikin, ji bo ku demdar bîrciwanên me ji xaweriya omîdan gavan bidine pêşerojê.

Çima em sûnd û peyemanan nadin hev ku tucarî dûrî hev nebin, ji dilê evîndar hemî arîşe û qedexeyan ji pêşiya xwe rêş nekin, bi yek dengî qîra desthilanînê nadin, li ser hîmê tekoşînê hemî qeyd û merbendan naşikînin, hin caran tavilî dibim ku çawa ezê dengê dilê xwe raguhêzim xaka welat, ku givalekên ewran rajorî evrazên çiyan xwe bi hevdû nexurînin, tucar tîrêja çiraxan ji birûskan venadin, pêkûristina peyvê ji kaniyên ziman dernabin, herweku ji kenyana lêvan û geşvebûna gulê, kêşesaziya helbestê hatiye afirandin, û hêj çavên me li ser sînorekî bê nişteman qerimîye, li ber sînga çiyakî asê bê şoreşvan hêwiriye, mîna nêçîrvanê bê tîr û kavan, qaşo me jana dilsoziyê ji nan, kevir û ziman naskiriye, û hîn jî çê tênegiha ne ku temenê xenêmayî ji giyanê ciwan buhatirî, car jî hene dil ji kevirê mefreq sert-tir dibînim, xewnan li ser devê birînê heldidêre,

navê agir li ser rûpelê bê guneh dişewitîne, lê her stirana jiyanê hêj bê gernejîn tête pêşwazkirin birayê ***Simaîl***.

Welato me hemî armanc bo navê te di dilê xwe de gencîne kirine, çendî rêawayên tev dek û weyne pir pilan û kêmewlene, çendî hemecûriya hezkirinê piralî û çirrwatene, dema ku baran tê, şermînî ji çîçekê direve, û kêlîka hêmen hest û newaziyan dixuricîne, bo min jî keko evîna welêt heyîna gel di jiyanê de diçesipîne, lê mixabin îro-roj kewt û komên ewran ji asîmanê herêmê mişext çûne, şalûr û bilbil gireva stiranê girtine, mane bi tenê li şûn kavlên berê jana bê kesî û keskayê dikişînin, ji ferhenga zimanê evîndaran peyvên sazeristê dinoşin, bang dikin dar û deviyan, emê ji kê re bistirên, xameyar dê helbestê ji kê re binîvisîne, hest, agadarî û newaziyên xwe ji kê re kevir li heste bixîne.

Welato me digot qey: Rokê xaweriya xwe ji te diziye, rivîna agir evîna dilan hartir kiriye, weku me jî ji hemî gerstêran razên dilê xwe ji rokê re gotine, loma me karîbû bistirên, êca emê bi melkeseke evsaneyî toza ser milê rokê rêş bikin, emê dengvedanê ji birûskê bistînin, heyvê daxînin ser rûyê gogzemînê, stêrkan lê bicivînin, li ber dadgeha evîndaran civanekî jê bistînin, ma qey hezkirina welatan şaşiye, ango me tenê bi hêza hêsiran dilgirtiye, gelo çima pîvaz di xaka ziwa de genî dibin, gelo kê em kirrîne, kî me difiroşe, me tucar ji bîr nekiriye ku kujer serbestiyê li dadgehê dikî, û di bin sîwana hetavên te de, arezûyên me li ber çavsoriya pirsê

beravêtî dikin, û bersiv di gewriya ziwa de kelecana nepevketinê dikî, em baş têgihane ku giraniya gerdûnê, tenha li ser pişta bêzaran hanê dikî, û pistîka keçkaniyê li ser milê rûmetê şax daye, û destnimêja velerzî li ber dergahê bihuştê dudilî maye, cejin li benda helkeftê ye, tewanbar û govan li ber peravan tî mane.

Dem dibûre birayê ***Simaîl*** û hêj em li şûnwaran bi tûpişkê katijmêrê re dizîvirin, mîna stêrkên derdora aheyvê ji tirsa rijiyanê helawêstî mane, mîna geryana mêşa hingiv ku kulîlkê li dûv kulîlkê xûm dikî û dipelînî, mîna çira bê gaz ku tucar vênakevî, barana ku tucar bê ewr nayê xwarê, dara bê bişkov ku tucarî ber negirtiye, loma min ji serî ve emaje pê daye ku jiyana bê evîn bêhodeye, herweku ez û tu jî bêyî welatekî azad, nikarin li cîhana evîndaran bijîn, lewra tişta ku min ji xwedê û xwediyan xweztiye, roja ku ez bimirim ji dêvla hêsiran, pînê xaka ku hûn dê min pê bispêrin, bi ava kaniyên welat binimînin, ji bo ku giyanê min di tenaya bergora hêwa de, bi katên keskesoran re gul vede, û xwerista welêt di bin hilfa şînesayîya asîman de li min û we bibe bihuşt, ayîstanekî bê hempa bo hemrahên min sînor bibe, min hîn bêtir xwaeztiye ku zanibim axa ku hûn pêlê dikinê, bi kîjan zimanî dipeyive, çiku ji zayînê ve perwerdeyî evînê kirime, lê mixabe ku mîrazyê gerdûnê ji pêkîna mirovaniyê ve, em mirî anîne jiyanê, û me zindî diajo nêv agirê dojehê, hîç dil nikiriye ku rojekê me azad bi bûk û zavetiya mirin û jiyanê şabikî.

Di sêwirim ku gorbihuştî ***Simaîl Umer*** weke min temîniya xwe wisa dibêje: mebest û armanca gewre bo min ewe ku xortaniya xwe azad, aram û aştiyane bijîm, bi kohên çiyan ve helperikim, dakevim kûraya binê gelî, gerekê li serdeşt, sinceq û beybaneyên welat bikim, avjeniyê di gol, avgîr û çemên welat de bikim, bê ku mikur bêm: dixwazim hemî lawên nîjadên min bi hastên xwe cejna rojbûyîna min nas bikin, bê ku ew jî zixurekî ji cî bilivînin, tenha zanibin ku hilfa min jî çûye ser wan, cejin û sersal tev hevçerxî jiyana me bûne, ji mêj ve min silav dane hilatina roka serê sibehê, xewnên xwe jî çarçuve kirine, xwezane û omîd serûbinî hev kirine, ta ku ji min hatiye deskeftên heyî ji çavînokên birçî paraztine, dîsa hêviya mine ku welat tev şêneyên xwe li kêmaniyên min biborînin, soz û peymanan bidine hev ku piştî mirina min şîn û girî nekişînin, lê belê bangeweşiya nûçe û salixên şadî û kamîraniyan belav bikin, aheng û vestîvalan li dar xînin, ji bona ku omîdên lûsiyayî ji dilê evîndaran nerevin, û xewn jî hêlînên xwe li ser mijankên çavan her çêbikin.

Li sermiyanan negeriyame, dîndijminê pera me, zêr û zeber min navê, lê belê bi şahiya zarokan re, bo cejna aştîxwaz û azadîhezan dilê min li çepikan dixînî, hinga bê pêjinî tenha bo tiral û tembelan dimînî, û rivîna agir bê etlayî di nava belengazan de dileyize, lem di xwînê de jî kat didin, û stiran ji herdû lêvan bi qitûtî têne nihurandin, şîna reşgirêdanê keş û heawayê bi tarîewrên

kîmawî dirapêçe, tanî bi qiralê rewanbirr karmendiya rewanmistkirinê piştguh dikî, loma xoşewîstirîn yadî ewe ku mirov serçavkên xwe ranekî, bo ku tucar birûskên bê meteh li evînê venedin, û rondik hew li ser jana dîrokê bêne barandin, bê guman em ji naxên dil birîn bûne, û îro kela oqyanosan hêçtir dipêle, geştî û kelek li îskele û kendavan natebitin, mîna şeva ku helbestvan dîno-mîno peyvan bi hev ve didrû û werbêj dikî, û di kerraya dawiya şevê de ji nîvê peyala vala avdeyên rista xwe dihûne, mîna mûma ku demdar hêsirên xwe dialêse, û hin jî ji kêfa devê wan gazekê vedibî, û hin dîtirê çavên wan ji hsiran venabin.

Lê pir daxe keko: ku hêj gelek ji me, di hêviya yadiyên heyamên kûr û dûr de kewijîne, çavên wan her timî ziq li paşin, û qet li pêş nazîvirin, weku hin ji pêşewayên rêxistinên siyasî tev rûdar, beg û serokêlên paşverû, nemaze ku her yek ji wan di kişwera tenistana xwe ya xewnedar de şûrê wî pasik girtiye, piştqof û hişpîr xwe sipartine ser gopalê riziyayî, bi serê hoza xwe sûnd dixun û rojiya yekbûnê girtine, û bo bernameyên rêkeftin û çarçuveyên pêşewatî, şîreta destêwerdêrên bêgane rêbaz kirine, bi yek carî berê xwe ji cemawir û rewşenbîrê serbixwe guhertine, ango cemawir bi hemî tîre û derbirînên xwe ve ew piştguh kirine, hîç hevrêjî pêşketina cîhanî û diruşmên hemdemî nebûne, şelafî, qeşawî û melaqiya xulamokan li ber tîna siysetê dikin, hemî mirovên civaknas, kadroyên hayîz û

ronakbîr xemsar kirine, ji binî şêwra giştî talan kirine, tenha bi tol û heyfên kevnar yên navxweyî daketine, bi dilsarî gireft û kêşeyên ku destgul siysîne, û dilsoziya miletê welatparêz û nemekdar bo doza evra bi derengî xistine.

Lê hema ji hêla rewşenbîr ve, biborînin ku ew jî bo heman rêbazê bi hev de pijiqîne, dilê xwe ji karûbarê siyasî dixelînin, tenha diramin ku dê Kurdistanê bi gilî û gazinên helbestiyane, ango bi çend peyv û boçûnan, bi çend wêjenivîsên rewanbêje pêk bînin, belbî bi tepiskekê şoreşekê li darxînin, miletê xwe bi saxtî raguhêzên çerxê vemanê, yekser tû û nefretê didine siyasî, nakokîbarin ji binî tengî bîrekariya konevanî nabin, pênûsa wan di kalan de bo hemî dabaş û babetên siyasî zingar girtiye, li benda ku serokêl, şivan û gavanên kurtebîn dewleteke hemdemî ava bikin, wisa herdû hêzên serpereştî li ber deriyê çerxê 21 ê - dûrî gunehan - destkêşî xwe bikin, gevezoka tiral û tembelan û destêwerdana esayişên çavpêl hêj li dare, bê vewestan û rawestan hewleke mezin didin ku xîmavê ji dilê pênûsa ronakbîr ziwa bikin, loma ez jî weke te dibêjim keko, ku bi hestên xwe neşaş bim, keş û hewa herêmî pergende û lewitiye, vêca derfetekê dixwazim bo ku li civanê roja gonê, ezê hemî razan bo we eşkere bikim, pîlan, raman û hemî helwestên bergûman ji we re riswa bikim, mat nemînin ku hêj li devera hanê bazara derewan dibe, kose berkoseyan gengeşe li kolanê bê

sergoş hiştine, li devera dîtirê hin kêmçare û derûnlawaz pênûsên xwe erzan firotine, hinan jî devên xwe şima kirine, erk û sezayê pênûsa rûmetdar bi derengî xistine, mane li benda ku bişkov bi kavşkî vebin.

Lewra mirov gelekî li ber xwe dikeve keko: nemaze ku hêj bîrlêkirina hozanî û zanistî dûrî destaye, tenha hewara me maye ku mezelê miriyan ji hestiyên ziman çanda yekgirtinê li babikin, li asteyekê mirov angoyî dimîne, gelo afrîdeyên wa ji civakê û qûnaxê sirgûn bûne, bi yekcarî alavên ragihandina pêşketî rêya xwe bi wan nexistiye, ango civak bi xwe ji wan mişext bûye, û di encamê de herdû ji hev tengijîne, êca ku li ber destê padîşahê goristanê guftûgoya miriyan nekin, û li ser destî gornepaşan hevdû haş nekin, di rêkeftin-nameyeke evra de daxuyaniya derngmayî û şevnistî dernexînin, ji hawîrdora masa girover gotebêja birayetiyê zelal nekin, û destguhêziya aştiyane bo serwatiyê bi parvenekin, lê pir mixabe ku tenha em mirî nayên guhertin, bi taybetî ku li vê redeyê zikê saxan ji hev tijîye, jehra kînê û rikberiya navxweyî henasên pêşerojê giravî kirine.

Vêca ku serê min tê de here tucar evînê bi kînê naguherim, rikberiya zavê hoza wenda ya paşdemayî û sûravka perçebûnê, li şûnwarê yekgirtina hemdemî rêbaz nakim, diruşma keysebazan û bangewaziyên pûçencam li şûna ala aştî û tenahiyê hilnadim, mîna teyrê baz dixwazim rizgar bifirim, li valahiya asoyan serbest birêsim, mask û rekeh bêhna min diçikînin, hewl

didim ku kemend û zincîran bişikînim, hîletê min ji evîna zorzane ya gerdîş û kilasîk diçe, mane we ez bê zabend hiştime, we nasnameya min ji mêj ve talan kiriye, we pelgnameyeke sor daye min, we xaka çandinî û avdêranê ji min sitandiye, we navê gund û bajarên me guhertine, pesteporta min jî bê vîzaye, paswan û qelawizên ser peravan, min û hemî kesên ku kêşeya azadiyê didozînin, bê pirs û rêdan wan binçav dikin, we mîna meymûnê ku iyarê şêr bikişîne serê xwe li me kiriye, we bê sûc û guneh em kirine pirojeyên mirinê, bê guman bo min jî xweş çesipiye, ku ne ji giringiya zimanê min yê netewî û nasnameya welatê min ya taybet û cudaxwaz bûna, ne ji sitratîjiya malbenda welatê min ya navendî li rojhilata naverast bûna, ku ne ji serjimara pir ya zendegî û dirameta ser û binê zemînê ya gencîneya dewlemend bûna, berî her tiştî we zimanê min talan nedkir, û ewqasî sînordaşên dagîrker bi ser welatê min de pelû nedibûn.

Lewma ji dilê evîndar her dibêjim: min tu divê welato, min bo te ji berbanga pêkîna mirovaniyê ve nimêj kiriye, hemî pîj û kelem, tabî û çeper, bendav û çiyarêz, fêrmist û mawer, bexçeyên gulîzaran, periyên bihuştê, firişteyên textê şahanî, xweşxane û sera, bergor û Terqînê serê me li hedan nexistiye.

Gihame payîza temen, hest û newaziyên evîna te hêj li giyanê min dixuricin, bi dizî pelemarî rewan û agadariyên min dibin, reha min neşê ye ku wan di xwe

de bê nasname veşêrim. Kurdistan destegul evîna mine birano, sîmbola evîndaran, pirzika ser zimanan, lehenga çîroka minî, bo wê zengilê dilê min bê rawestan û vewstan her û her lêdixînî, eger ku dîrok çavên xwe veke û ji temara derziyên bencê hişyar bibe, ji nû ve bîneriya xwe li ser dîrokfiroşan bi têr û tesel bibêje: û serboriyên min/te/we û yara evra bi pelge û çavkanî ji we re bibilîne…sipas.

***Sersaxî***

Bo xizm, kesûkar, hevaljiyan û zariwên wî.
Bo miletî Kurd û Kurdistan.
Bo hemî heval û hogirên wî.
Zindarî bo giyanê nemir ***Simaîl Umer***.
Her bijî Kurd û Kurdistan.

***Qamişlo 20 – 10 – 2010***

Helbestek diyarî rewanê   nemir Ismaîl Umer



Perîşan

bijî xwediyê tevgerê çak û pîroz

namirin ew di dîroka gelê me

belê bilind cih bo xwe di grin

şewqa wan himbêz dikê ezmanê me

dewsa sitêra wan herdem xuya ye

mûma wan wê şewqê bidê riya me

gula wan wê bi ruh û jîn û can bê

ziwa nabê ji jînê ser masa me

çendî ku wan nebînim nav civata

çendî ku em bibêjin ma ew kanîn

çiqas dûr bin ji tevger û xebata

namirin ew her dem têne bîr anîn

helbesteke nemir ji bo nemir

peyv tenê xwe ji wan re di tewînin

bela serok li ber siha peyva me

li her destê serê xwe bi çemînin

divê rabim herim cem torevana

ber rembazê hişt û peyva bibînin

li keleş û li tîrêj bibme mihvan

weke carê ji mer ristan bixwînin

belê çend pirsê me hene bê bersiv

li ba tîrêj bersiva wan dibînim

gelo çawa helbestek bo nemir

çawa gotina li ber hevdû dînim

Ismaîlê Umer îro ji nav me barkir

kîjan peyvê di mafê wîd bibînim

pênûs nema zanê şadî ji ku tê

tenê şînê dibînin penusê me

ma wilo ye çerxa felek bê bexte

pextiyê tim dikê pişik û para me

Ismaîlê 'Emo karek bedew kir

rolek mezin leyisit nav tevgera me

piştî we pir sitêrê me rijiyan

konê reş tim vedabo ber derê me

dizanim hun dizanin çend nexweşe

zilim û zora dibarê ser gelê me

ew volkana teya ser mele palo

ji not û yekê ve hîn li bîr tînim

nabînim tu kesê weke te bal kêş

di mafê nemiran de baş di dînin

dest pêk çawa bê bi çi tîpî dest pêkim

çawa imaca ji nav rokê re bibînim

çawa pîvan bikim pêşî û paşî

kîjan hespî ji rêzbendar bi şînim

laxir bê yan çeleng bê yan sivik bê

di rewan deng vedana deng di bînim

hîna pêwîste bo me şîret û şur

heta saxim xwe şagirt ji wer di bînim

têkoşer bû ji nava me koç ber bû

ji lewma pir pêwîste we bibînim

seyda wê ana mihvanê we werê

gulek buhuştî tê bi diyê ji dil me

bêjiyê kû xwedanê karê pîroz

namirin ew di dîroka gelê me

belê bilind cih bo xwe digrin

şewqa wan himbêz digê ezmanê me

## Isma'îl Umer çû, ma?



Qado Şêrîn

Sê roj mîna sê sedsalan derbas bûn, hîna jî hewl didim ku hest û hezkirina xwe eşkere bikim, mixabin min nikarîbî. Mîna çûkê serjêkirî li nameya xwe digeriyam

Dema min ew nûçeya xemgîn û kambax bihîst, min xwest derew be, min xwest xwe bixapînim û ji jiyanê dûr bikevim, min bi destê ADAROyê xwe yê biçûk girt û me berê xwe da stêrkan. Nizanim em çiqasî li derve, li ber bêhna pelên daran ên weşyayî man, lê ez zanim em gelekî mabûn, ji ber ADARO westiya bû.

Gotin û peyv di ku de asê bûne, gelo pênûsa min a qambostî li hember qama te ya bilind ji kîjan darê weşiyaye, gelo peyv û gotin jî di dema payîzê de mîna pelê daran diweşin û xwe ji ser riya pênûsan didin alî, yan gotin û peyv jî deyndarên bejna te ne ûxwe ji roja

din re, roja ku emê hemû bi şoreşa te rabin, xwe amade dikin. De ta wê rojê bila serê xwe li ser dilê min deynin.

Min tim guman dikir ku bejnên bilind giyanên pêxemberên bi hezarên salan di zelalbûna ava û bexçeyên hêvî û ramanan de, diparêzin. Û giyan ne giyanê wan e, ramanên wan dibin çûk û li ser pencer û darên di tabloyên gêncên me de bi cih dibin.

Isma'îl Umer, te ew dilê nazik û zimanê nermik li ser çi refikî danîn?, gelo te ew jî liyaqî giyanê kesî nedît û diyarî bêhna axê kirin?.

Isma'îl Umer; em ê bi çi rûyî dîroka te li ser eynî riyê dubare bikin, mane me li ser hezkirina te li hev nekiribû, tê hîn jî rê û xaçirêkan li pêşiya me bi raman an bi gulên xwe bixemlînî?, de bila dilê te yê nazik fanosa di destên me de be û em tiştekî din ji te naxwazin.

Ah, aaah, heçê mirin di bîr û bala wî de be gunehan nake. Mirin xeyd û cudahiya di navbera giyan û giyan de ye û ne xeyd û cudahiya di navbera laş û giyan de ye. Îca kîjan mirinê tu talan kiribû, tu li ber kîjan lehiyê biribû, bayê kîjan mirinê giyanê te bi jor û ber bi asmanan de bir?, jixwe mirin tenê dikare hezkirina me ji bejnên bilind re nû bike.

Û ji bo te Isma'îl Umer, dostê nemir mirin jiyan e.

Gelo piştî rijandina çend stêran emê di bin barê hezkirina

te de, li ber ba û bahoza hezkirina te, li xwe haydar bibin
û li xwe mikur bên: em hîna jî ji te hez dikin.

20/10/2010

www.qadoserin.com

Xwatirxwestin



Salih Cefer

Dîsa wekî her car ketim nav xem û xeyalên xwe yên belav kirî

Di quncikên tarîde gerîyam

ku kel û pelên bîranînên xwe bidin hev

Matmayî mam

Bê bersîv mam

Li dora xwe gerîyam

Ev çi xwatirxwestinê

Ev çi koçkirine

Ev çi nişkavkirine

Lê dizanim

Her ku  xewn û xeyalên min dûrî talan û bêmafîyê dikevin

Her ku dilê min ji xemgînîyê bêpar dibe

Her ku gulên westîyayî di henavên min de berve geşbûnêde diçin

Her ku hevîyên min yên şekestî ber  bi asîmanan de difirin

Her ku xeweke bê tirs dibe mêvana hestên min

Ez li ser dengê hawareke dilsotinî di xerîbîya xwede digevizim

Di nav rojên ji rengê xwînê sorbûyî, rengên hestên xwe wenda dikim

Û dibêjim :

Gelo çibû? kê xwatir ji me xwest û dê kî ji me bixwaze ?

De, win bi heqê wan rojên bi ked û westabûnê xweşbûyî vê yekê li me nekin

De win bi heqê wan hestên bi bîrînan dagirtî vê xerîbîya me dijwartir nekin

Em li benda wê rojêne ku disa wan kul û derdan

Li welat careke din bi hevre pareve bikin

Bi germîya wan rûniştinên di ciyên tarî de sarbûna
xerîbîya xwe germ bikin

Salên xerîbîya me dirêj dibin û winjî bi lezin

Ne em kanin ji dest brûsk û ewr û tavên hovane bigin we

û ne winjî kanin li hember neheqîyê dilê xwe aram bikin

dilê we û sirgûnîya me li benda dîtina hevin

de bese xwatir ji me nexwazin

de îdî sozê pêşwazîkirinê bidin me

Salih Cefer

32.10.2010

diyarî bo giyanê nemiran

Sami Nasiro û Ismaîl Omer

Ismaîl Umer; Cejna we pîroz dike



Silêmanê Mecîdo

Ji roja ku ez ji welêt derketime û heya aniha, her sal min di sê cejnan de telefona mamoste Ismaîl Umer dikir, cejna Newrozê, Remezanê û ya Qurbanê, û li wî pîroz dikir. Di cejna Qurbanê ya îsal 2010-ê de weke hemû caran min vê sibehê telefona mamosteyê xwe Bavê Şiyar kir, lê vê carê kesî telefon ranekir û bersiva min neda!, Îca min telefona kurê wî Bengîn kir, wî li min vegerand.

-Roj baş Bengîn, hûn çawa ne? Baş in? Ez telefona Bavê Şiyar dikim, lê telefona xwe ranake? Ez dikarim pê re baxêvim?

**Bengîn:** !!!!!!!!!!!!!!!!!!!! (seyr ma). Di dûv re li xwe haydar bû ku bi min re ye, wî got: bavê min çûye mêvandariya nemiran.

-Tu dikarî telefonê deynî ber serê wî, da ez pê re baxêvim?

**Bengîn:** Belê, ser çavan...

-Roj baş, cejna te pîroz be Bavê Şiyar… Hûn çawa ne? Malî çawa ne?

**Bavê Şiyar:** Cejna te jî pîroz be. Tu çawa yî? Tu baş î?

Bi gotin û lêpirsîna wî re min dest bi girî kir…

**Bavê Şiyar:** Tu çima digirî, hevalê Silêman?

-Ev giriyê kêfê ye mamoste, ku min vê carê jî karî bû dengê te bikim û bi te re bipeyivim.

**Bavê Şiyar:** Nexem e, birayê Silêman… Ez dikarim her demê bi te re bipeyivim…

- Heval çawa ne? Bi tayebet Bavê Helebça, Dilawer, Bavê Kesra û Zerdeşt û yên din?

**Bavê Şiyar:** Birayê Silêman, tu dikarî vê carê ne tenê pirsa van hevalan ji min bikî, lê belê pirsa Mele Mistefayê Barzanî, Ebdil Rehman Qasimlo, Dr.Sadiq Şerefkendî, Qazî Mihemed, Şêx Seîdê Pîran, Seyid Riza, Osman Sebrî, Mihemedê Mele Ehmedê Tûj, Ehemdê

Xanî, Feqiyê Teyran, Cegerxwîn, Tîrêj, Mihemed Şêxo, Bêbuhar, Nuredîn Zaza, Ebdil Hemîd Zîbarî, Ebdil Ezîz Şêxo, Hisên Koro, Mamoste Edîb, Hisên Hemê, Şêx Maşûqê Xeznewî, Silêman Adê, hevalên 12ê Avdarê, hevalên Newrozê, zarokên sînemaya Amûdê û gelekên din jî bikî…

-Ezê kêfxweş bim, eger tu bikaribî rewşa Barzanî û hevalên wî bi min bidî naskirin?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe serokatiya parastina kurdan dikin…

-Apo Osman Sebrî çawa ye?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe ji bo pêxistina ziman û çanda kurdî dixebitin…

-Hevalê me mamoste Ebdil Hemîd Zîbarî çawa ye?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe di bin darên zeytûnan de nifşên nû perwerde û fêrî hezkirinê dikin…

-Mamoste Ebdil Ezîz Şêxo û Hisên Koro çawa ne?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe serokatiya dadweriya Kurdistanê dikin…

-Ehmedê Xanî, Feqiyên Teyran, Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj û Bêbuhar çawa ne?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe rêberiya wêje û çanda

kurdî dikin…

-Mihemed Şêxo û Hisên Hemê çawa ne?

**Bavê Şiyar:** Ew û hevalên xwe rêberiya mûzîk û hunera Kurdistanê dikin…

-Spas mamoste, te bi van agahiyan dilê min şad û geş kir…

-Dema tu bi destê şêx û hezkiriyên xwe hatî guhestin, çima tu bi ala Kurdistanê ne xemilandibûn?.

**Bavê Şiyar:** Ji ber ku ala Kurdistanê bi min re bû, li kêleka dilê min bû… û vaye hîna jî bi min reye.

-Spas mamoste…Te pir kêfa min anî û bêhina min derxist…Silavan li tevan bike û cejna hemûyan jî pîroz bike…

**-Bavê Şiyar:** Tu jî gelek silavan bike… Ez têm çavê zarokan, rûyê gênc û eniya mezinan, û cejna gelê kurd pîroz dikim… xema me nexwin, em li vê derê azad û serbest in, em azadî û serxwebûnê ji we re dixwazin.

-Bi xatirê te, heya cejna newrozê hûn hemû, hemû dost û heval û gelê me bimîn in di xêr û xweşiyê de…

**16.11.2010 (Roja cejna Qurbanê)**


Silêmanê Mecîdo

Bavê Şiyar Newroza we pîroz dike

îro 20.03.2011-ê min telefona Bavê Helebçe kir, ku ew yek ji hezarên dostên Bavê Şiyar e .Min pîrozkirina cejna wî, malbat, dost û hevalên wî û bi taybetî ya Diya Şiyar kir, ya ku di vê êvarê de 21 mûm li dora gora Bavê Şiyar vê xistin. Wî jî ji aliyê xwe ve cejna me teva pîroz kir.
Min yek ser jê xwest, ku ez bi Bavê Şiyar re bipeyivim. Ji min re got:
Ez pir kêfxwe im, ji ber ku ez jî beriya hinekî pê re axifîm… Fermo…
êvar ba Bavê Şiyar, cejna Newrozê li te pîroz dikim û ez bi hêvî me, ku ev cejn li gora hêvî û daxwaziyên te be.
Bavê şiyar: Belê, ev cejna Newrozê cejna mirovê azad, xurt, netewî û leheng e. Ez bawer im, ku Kurdistan dê bi

we di vê rojê de çê bibe.
Cejna Newrozê aniha li ba we bi çawa awayî tê pîrozkirin?
Bavê Şiyar: Cejna me ya Newrozê bi rengekî pir bi rêk û pêk tê pîrozkirin. Ji ber ku alava Newrozê bi destên Silêman Adê, hersê Mihemedên Newrozê, Zîlan û Leyla Qasim bi serokatiya Qazî Mihemed li bajarên Kurdistanê digere… Me ji Çiyayê Kurmênc dest pê kir, me berê xwe Qamilo heya em gihan Mahabadê, lê me tu bajar bê agirê Newrozê ne hit. Ez bawer im, ku we jî ji bo Newroza îsal amadakariyine ba kirine…
Belê. Li gorî amadekirina me û li gorî dema îro, Newroza me dê bi wateya xwe ya rast bê pîrozkirin. Ji ber ku ev qonax, qonaxeke nû li ser gelên Rojhilata Navîn e.
Bavê Şiyar: Rast e. Li cem we guhertineke nû pêk tê, ku ji sedên salan ve ev tit çê ne bûye. Lewre ji we tê xwestin wek partî, siyasetmedar, rewenbîr û nivîskar, ku hûn ji vê qonaxê re ba hiyar bin û hemû hêz û karînên xwe bixin wê de, ji ber ku hebûn û tunebûn tê de tê xuyakirin. Ji ber ku roja Newrozê roja nû ye, divê mirov jî xwe nû bike, Îdyolojî, kar, nêrîn û bîr û baweriyine nû peyda bike. Ji ber wilo jî ev bar barê her kesî ye.

Min bêriya we teva kiriye û ez dixwazim li rewa we bipirsim…

Rewa me bi tevayî ba e, lê tenê titek heye, ku ez dixwazim ji te re bêjim. Min û Bavê Helebçe me dixwest

em bên cem te (Em hersê li ser telephone digirîn). Ez nikarim aniha wek heval bêm cem te, ji ber ku hevalan rûmeta endamtiyê ji ser min rakir…

Bavê Şiyar: !!!!!!!!!!!!!!!!!!!!!!!! Çima?



Newroz 2011



Nweroz 2011(diya Şiyar)

Ez naxwazim di vê demê de tu kes bê ba me, ji ber ku aniha hûn tev ketine ber berpirsiyariya hebûn û tunebûna vî miletî de. Ya din ji ber ku ew sedem tune ne, ku ez bêmba we yan hûn bên ba min.. Sînor ne mane, ji ber er nêzîkî hev in û bi ê, derd, kul, kêf û ahiyên xwe li gel hev in.

Rast e.


Bavê Şiyar: Ez cejna Newrozê li we, gelê kurd û Kurdistanê û tevaya gelên cîhanê pîroz dikim. Hêviya min ew e, ku di vê Newrozê de planên avakirina dewleteke kurdî bêne kirin, da ku hûn Newroza xwe bi awayekî kernevalî pîroz bikin… Ji ber ku ev milet hêja ye, ku bibe xwedî welat…

Ez jî hêvîdar im, ku ev titên te xwestin, di vê Newrozê de bi cih bibin. Bi xatirê te û heya Newrozeke din.

Bavê  Şiyar: Ser çavan, hevalê Silêman… Silav bo te û hemû dost û hevalan. Heya Newrozeke din hûn bimînin di xêr û xweiyê de.

20.03.2011

Fêrisê netewa kurdî. Îro bi birînên dilê xemgîn ji
Hespa xwe hate xwar



Xalis Msewer

Ji bo koçkirina serokê partiya (yekîtî) bavê Şiyar mamoste û siyasetmedarê çeleng û fîdakar û hêja, bi hêsir û hesret, û ahîn, û nalîn, sersaxyê ji malbat û hval û hogir, û ji tevahya miletî kurd re dixwazim.

Qet me tucaran nizanîbû ku giyanê Bavê Şiyardi rojeke kurdî yên bê ewle de li hêvya qederê rawistiyaye, pençê vê mirina bêbext ew zû û bilez ji nav me revand, di wê dema ku hîn em bi hewceyê mana wî bûn, vî xweşmêrî bi hêlemêl koça xwe ji nav me barkir û çû, lê ev çûna ha ji lebat û xebata kurda re xisarek mezin û bêhemtabû .

Ismaîl Omer Bavê Şiyar mirovekî çelenk, zîrek, Bênefs, û bê hawe şareza û aqilmed bû, û dihate hezkirin û diket dilê herkesî de.
du rengê kesayetiya Bavê Şiyar wî belî û paqij hebûn,

yek jê ew kesayetiya wî ya siyasî bû, ango di warê siyasetê de siyasiyeke zêrekbû, û di ya civakî de jî bi heval û dost û nedostên xwe re jî, mirovekî peyvxweş û milayim û bê zirarbû, weha vî mirovî karîbû hezkirina xwe di dilê herkesî de biçîne.
Raste bavê Şiyar bi laşê xwe ji nav me barkir, lê bêgûman wê fikir ,daxwaz, û ramanên wî, di nav miletê wî de berdewam be ta ev milet li dinê hebe. daxwazên wî jî xewş têne xuyakirin ku, hem yekîtî bû û hem jî mafê miletî wî yên siyasî û rewşenbîrî û netewî bû. ji ber ku vî xewşmîrî dilê xwe dabû miletî xwe, û ev dil di ber vî miletî de hatibû westandin, ta bi hesret û kovan hate rawestandin û sekinî, dêmeke ku em hezkirina Ismaîl Omer di dilê xwede biparîzin, ne hewceye ko îro em li ser bigrîn yan li xwexin, ya rast ewe ku em fikir û ramanên wî biparêzin û li daxwazên wî bi xwedî derkevin û liser rêça wî bimeşin, û wan daxwazên giring pêkbînin.

Bavê Şiyar bi delalî
Bi rihetî
Û Bi selamet
Di gora xwe de razê
dilê tenî tenik,
Bi ritim û sîmfoniya netewî
dijenî
dilê tenî îro westayî
ku dibêjin:

sekinî
lê vaye ev dilê sekinî
Di dilê nûhatên kurd de
Dijenî
Şopa  navê te li ser
Van dilên sozdar
Bi ava zêr
Hatiye neqişandin
Razê bê xem û kul
Razê
Wê rojekê
ewrê tarê
Li ser ezmanê me
Kurdan
Rabe.

Bi koçkirina xwe Ismaîl Omer xelekek



Zagros Osman

dîtir bi ser Zincîra kulê me de berda
Zordarî û sitemkarî ne besbûn,girtin û lêdan ne besbûn,belabûn û tenaberî û valakirina welatne besbûn, perçebûn û nakokî û pûçbûna tevgera siyasî a gelê me ne besbûn, hejarî û birçîbûn û nesaxî û zûhayî ne besbûn,pîlan û Dekên hêzên navdewletî di gel aliyên herêmî bo nehêlana birsa kurdî ne besbûn, birayrên sêdarkirina miletê me nebesbû,înca di evan nîrên dijwar de,di evê qonaxa herî xerab de a ku li gelê me asê bûye û nahêle ku ew xwe ji ewê rizgar bike, mirinê jî destê xwe daye dijberê netewa kurd ,û yeko yeko xebatkarê pirsa kurdî ji nav me direvîne ,di vê biwarê de zincîr dirêje û xelekên ewê pirin, va îro jî  Ismaîl omer xelekek dîtir bi ser Zincîra kulê me de berda,dema ku wilo ji nişkave mirinê ew ji nav me revand.
bavê Şiyar mirovekî welatparêz bû ,barê vê xakê evî miletî hilgirtibû,rêberekî dilfireh xwe newestyayî bû,

derd û kula wî ew bû ku rêxistineke siyasî kurdî yekgirtî û nûjen bibîne,kar û xebata ewî bo vê yekê diyare,çimkî ewî bi nerîna xweyî kur û dûr dîtibû ku aliyên dîtir ,tu rûmetê nadin tevgera kurdî ku ev tevger nebe yek, her weha di zanîbû ku gelê kurdî bê yekitî tu caran nikare nêzîkayê li rêka durust bike bo mafê xwe bistîne. Bêguman koçkirina lîderekî mîna mamoste ismaîl ziyaneke mezine ne tenê bo partiya ewî an bo bizava kurdî lê belê ziyana mezin para gelê meye ,hêviya me ewe ku hevalên ewî li şûpa pirensîbên ewî ,rêka xebatê berdewam bikin, û bela cihê wî buhişt be .

**Zîn Îbo-Cimo**

Bira û xûşkên berrêz,

Dostên hêja,

Mêvanên delal,

Me Kurd perwerek, Netewperwerek, Rohilatperwerek hunda kir ; hemû durvên Kurdperweriyê, Netewperweriyê û Rohilatperweriyê di hevalê Îsme’îlê‘Emo de bûn ;ev durvên ku di çi dem û ciyan de bihana bêhempa ne, nayêne pîvan, nayêne bazarkirin. Belê, têne peydakirin, têne dîtin. Ew jî li cemkê ? Li cem rêber, canbizar, pêşmerge û şehîdên dozekê, welatekî, miletekî.

Îsme’îlê‘Emo ew kesebû, ew rêber bû, ew serokek bû, ew merde bû, ew Kurde bû, karibû bi keta wî kerwanê nemirên Kurd û Kurdistanê. Jiyana xwe bo gelekî ku sitem û neheqî lê hatiye kirin, terxan kir ; bo mafên gelê Kurd û çarenûsa wî ji xortaniya xwe de koşa, xebitî û xwe pir westand, heta kêlîka ku Kasa Nakew serê ya Sokrat bi servehatîkirin.

Îsme’îlê‘Emo serokekî Kurdperwer bû, ango cîranperwer û navnetewperwerbû ; dozaheqiyê, rastiyê, dadê, wekheviyê yek didît, çi bi navê Kurda bû, çi bi navê Ereba bû, çi bi navê Tirkabû, çi bi navê Farisa bû, çi bi

navê Ermena bû, çi bi navê Aşora bû, çi bi navê miletên derveyî Rohilat bû. Ew dozewerrêyekdidît.Xas li nik Îsme'îlê'Emo 'Am bû, û 'Am Xasbû.

Îsma'îlê 'Emo Îsme'îlê 'Amêbû, ê gelê Kurd bû ; 'Emo bapîrê vî Xasîbû, bapîrê Îsma'îl bû. Îsme'îl Xasê gelê Kurd bû, lawê gelê Kurd bû. Gelê Kurd gelza deye ; zade û xas û kurrên xwe ji bîr nake, bi bîr tîne, nemir dike, nemir dibîne ; serê wî sax dike. Serê we jî sax be.

Parîs, 30.10.2010

**Civîna Dawî..!**

**Bi pênivîsa: Hevalekî Bavê Şiyar- Hisiça.**

Gelî guhdarên hêja û xweşewîst!

Ev roj, roja civîneke ye .. roja civandina me î bi rûmet û pîroz e,

gelo hûn li bendeyî bavê Şiyar in?.Gotinek wî heye…..? wê bêhinekê ji we re bipeyive.. gotarek rêzanî wê ji we re bêje…û bixwîne… belê, diyar e, ji hebûna cemawerê pir ko wê bavê Şiyar xudanê danûstendinê be…

Ho… bavê Şiyar ka ferm bike… çima pêjna te nayê!.. bê dengiyê em reswa kirin.. bêxwedîtiyê em perîşan kirin.. bêpirsînê em winda kirin.. de ka fermo bike ez qurban tu li ku ma…?!! Zingîniya peyvên te hîn li ber guhên mene.. te weha digot. (Hespê qels ne nîşana cirîdê ye..).. te weha jî digot ( Erkê tevgera Kurdî ne tenê bo pêkanîna mafê gelê me î kurd e, lê belê ji bo parastina wî ye jî). Bêje hevalo bêje.. hey siwarê peyva rastgo, hişmend û aqilmendê gelê min…. bêje hevalê min.. bêje serokê min. Em guhdarin… gotin tim û tim ya te ye.. rêberê gelê min..

Hey Qereqoyê… xweziya min bi dilê te tenê ko her dem û her çax bavê Şiyar mêvanê we ye… xweziya min bi civatên we û bi şevbuhêrkên we.. şêrîntirîn peyv û

serpêhatî û hevneşîn.

Şîreta min li we xelkên Qereqoyê û yên derdora wê tev werin şevbuhêrka wî –kal, pîr, xort, qîz, gênc û zarok.

Erê hevalê min,  tu ne tenê serokê partiya xwe bû, belê tu tekoşerekî bêhempa û gewre bû. Tu gernas û xemxurê yekbûna peyva Kurdan bû. Tu di sincê xwe de payebilind bû. Digel weha tu nefis biçûk bû. Bi biçûkan re biçûk bû, bi mezina re mezin bû. Em dost, heval û nasên te soz û peymanê didin ko emê li ser riya xebata te bişopînin û qet bernadin.

Serokê min, rêberê min, stûna tevgera azadîxwaza welêt.. tê bimînî nîşana tekoşîn, aştî, biratî û azadiyê.

Em sersaxî ji gelê me î Kurd re û bi tevahî yê Sûrî re û bi taybetî ji heval, dost û malbata wî re dixwazin.

Gorbuhişt be bavê şiyar….

Sed mehder li giyanê te bibare..

Hisiça

28/11/2010




çilrojî, Başûrê Kurdistanê



çilrojî li Emîrat a erebî



Belcîka



Hollenda


**Swîsra**



**Qamişlo**



Newroz 2011



Newroz 2011



Newroz 2011





behiya nemir li Essen(Elmanya)



behiya nemir li Essen(Elmanya)-Hesenê Gemo û Qado Şêrîn



behiya nemir li Herne(Elmanya)



behiya nemir li Essen(Elmanya)

Naverok


| | | |
|---|---|---|
| Pêşgotin | | 2 |
| Jiyana nemir Isma'îl Umer | | 7 |
| Abdisemed Mehmûd | Birîna demê | 23 |
| Abdisemed Mehmûd | Venamire dîroka te ? | 25 |
| Apo Cimo | | 27 |
| Arya Cimo | Ala Rengîn | 29 |
| Bavê Helebçe | Qehremanî.. | 31 |
| Dilawerê ZENGÎ | Ji rêberê gelê.. | 35 |
| Dilawerê ZENGÎ | Ey mirin | 38 |
| Dilawerê ZENGÎ | Bavê Şiyar.. Namirî! | 41 |
| Ekrem tehlo | Koça reş | 43 |

| | | |
|---|---|---|
| Heyder Omer | Rêberê rênas | 49 |
| Keça Kurd | Nayêne jibîrkirin | 52 |
| Komîta Dicla | Xêzên zêrîn bê dawî man | 56 |
| Lewend Dalînî | Awazên welatperwerekî | 59 |
| M.E.Heso | Mamoste Ismaîl Umer | 62 |
| Mihemedê Seyid Husên | Kurd ji malzaroka.. | 66 |
| Perîşan | Helbestek diyarî Ismaîl Umer | 93 |
| Qado Şêrîn | Isma'îl Umer çû, ma? | 97 |
| Salih Cefer | Xwatirxwestin | 100 |
| Silêmanê Mecîdo | I. U; Cejna we pîroz dike | 103 |
| Silêmanê Mecîdo | I.U Newroza we pîroz dike | 108 |
| Xalis Msewer | Fêrisê netewa kurdî | 113 |
| Zagros Osman | Bi koçkirina xwe.. | 116 |
| Zîn Îbo-Cimo | | 118 |
| Hevalekî Bavê Şiyar | Civîna Dawî..! | 120 |
| **Wêne** | | **122** |